

Welatê Me

**PARTİYÊN DEWLETÊ
XITIMÎNE**

Cîgirê Serokê HADEP'ê
Osman Özçelik li ser
sosyalist înternasyonal
û Cem Boyner peyivî.

Rûpel 2

ROJNAMEYA HEFTEYÎ

SAL:1 HEJMAR:8

8 RÊBENDAN 1994

BUHA:25.000 TL(KDVD)



Li Kurdistanê di eynî wextê de çar demsal dikarin bên dîtin. Kurdên ku gundên wan tên şewitandin ji bo ku ji xwezaya welatê xwe dûr nekevin li ber xwe didin. Ji ber ku li Kurdistanê gund biqedin jî jiyan didome û zarokên agir li benda wê roja azad û serbixwe ne.

'HEMÛ TIST BI PKK'Ê VE HATINE GIRÊDAN'

Mebûsê SHP'ê ji Dêrsimê Sinan Yerlikaya li ser siyaseta dewletê ji Welatê Me re xeber da

DI VÊ HEJMARÊ DE	
Dawiya dîrokê	Rûpel 5
Yew film yew sermiyan	Rûpel 13
Binêre qeymeqam beg!	Rûpel 6
'Em ji rê dernakevin'	Rûpel 3
Sêvê û Delaliyê	Rûpel 14
Çi heyf e ku êş tîn jîbîrkin	Rûpel 7
Çi bextiyar e, yê ku	Rûpel 14
dibêje 'ez şîzofren im'!	Rûpel 4
Vê nivîsê bixwînin û bidin xwendin!	Rûpel 15
Tu bi xêr hatî nava kabûsê!	Rûpel 5
Li Kubayê tengasî zehf in!	Rûpel 16
Kurd bi zimanê xwe kurd in!	Rûpel 14



- Dema em behsa vê meseleyê û behsa mafên gelê kurd dikin, PKK'ê daînin ber me. Lê, li gorî baweriya me ev her du mesele ji hev û din cihê ne. Divê PKK û doza mafên kurdan ji hev bêne veqetandin. Em dibêjin ku PKK hebe jî tunebe jî ev pirsgirêk heye û divê li ser bête axaftin.
- Lê ordiyê di van oprasyonan de, li "Tunceli"yê ne guh da hiqûqê, ne wîjdên û ne jî însaniyetê. Di wan operasyonan de helikopter hatin bikaranîn. Muxtar û gelê wê derê şahidên vê yekê ne. Dewlet dibêje: "PKK'ê ev der şewitandine." Em dibêjin yek an du gund ji aliyê PKK'ê ve hatin şewitandin, ê baş lê gundên din çawa hatin şewitandin?

Rûpel 8-9

Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik:

'PARTIYÊN DEWLETÊ XITIMÎNE'


DÎWAR TÊNE HILWEŞANDIN

Sala çûyî, kurdan di warê siyaseta û diplomasiyê de xebatên pak û hêja pêk anîn. Ji aliyê din ve, gelek tişt derxistin ber tavê. Rûçikê gelek şexs, partî û saziyan dan diyarkirin. Di vir de hewce ye ku helwesta SHP'ê ya di civîna Sosyalîst Înternasyonalê de bê nirxandin. Ji civînê re SHP'ê mazûbanîyê dike û mijara wê kurd in. Lê dîsa jî partiyeke wekî HADEP'ê nayê dawetkirin. Mirovên mîna Tarîk Ziya Ekinci, Feridun Yazar, Sırrı Sakık, Muzafer Demir, jî parlamenter û endamên SHP'ê Ziya Halis, Ercan Karakaş, Fehmi Işıklar, jî rewşenbîrên tirk kesên nola Nevzat Helvacı, Prof. Dr. Zafer Üskül, Prof. Dr. Baskın Oran beşdarî civînê dibin. Wê li ser kurdan civîn li dar bikevin, lê kurd bi awayekî rêxistinî neyêne temsîlkirin? Sebebê vê yekê diyar e. Naxwazin kurdên ku li xwe, mafên xwe, li gelê xwe xwedî derdikevin û birêxistin in beşdarî civînên wiha bibin. Lê kurd êdî guherîne, bi vê rewşa kambax qîma xwe naynin. Paçikên di guhan de derdixin.

Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik, der barê Civîna Sosyalîst Înternasyonalê û li ser amadehiyên ji bo endamtiya Înternasyonalê agahî dan rojnemaya me. Ji aliyê din ve, nêrînen xwe yên li ser YDH'yê jî diyar kirin û hewlên ve partiyê wekî "ji tengasiyê filitandina dewletê" bi nav kir.

Özçelik, li ser endamtiyê daxuyand ku Serokê Komîsyonê Conny Frederikson gotiye wan ku tu astengek ji bo endamtiya HADEP'ê nîn e, bes şertên rêxistinê hene û li gorî wan şertan serilêdan tene nirxandin. Her wiha Frederikson derbiriye ku, ji bo serilêdana HADEP'ê bê qebûlkirin, wê bi xwe bibe alîkar. Özçelik daxuyaniya xwe wiha domand: "Di civînê de me xwestina xwe ya ji bo endamtiyê diyar kir. Xwestina me muhîb dîtî. Conny Frederikson, ji me re gote ku ji îro pê ve çî civînê Sosyalîst Înternasyonalê çêbibin wê me dawet

Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik:



bikin. Niha di rojê me de, mijara pêşîn amadehiyên ji bo endamtiya Sosyalîst Înternasyonalê ye."

Ji bo girîngiya endamtiya Sosyalîst Înternasyonalê jî gote ku, wê êdî dewlet bi hêsanî nikaribe partiyê bigire, ji ber ku wê şemsiyeya rêxistinê li ser serê wan be û wê li endamên partiyê jî xwedî bê derketin û wê bêne parastin. Özçelik

li ser vê mijarê gotinên xwe bi vî awayî qedandin: "Bi ya min di nava xebatên politîk ên legal ên kurdan de, ev gaveke girîng û nû ye. Êdî di civînê navneteweyî de wê kurd li ser meseleya xwe biaxivin. Ne ku hinên din li ser navê wan biaxivin."

Cîgirê Serokê Giştî Özçelik diyar kir ku, ji ber ku SHP ew dawet nekirine, di civînê de wan rexneyên giran li

helwesta wê girtine û ew wekî partiyeke ne sosyaldemokrat û diktator navandine.

Der barê YDH'yê ya Cem Boyner de jî nirxandinek kir û derketina ve partiyê wekî hewlên ji bo derketina ji tengasiyê yên dewletê hilda dest û bi vî awayî gotinên xwe domandin: "Li Tirkiyeyê partiyên dewletê xitimîne. Gelê kurd jî û yê tirk jî ew baş nas ki-

rine. Ji ber vê yekê dewlet dixwaze ji xwe re riyekê veke. Mecbûr mane ku tiştên nû bibêjin. Tiştên nû jî divê ku li ser meseleya kurdan bê gotin.

Heke YDH ne ji dilê xwe, van tiştên nû bibêje jî, dîsa rewşeke qenc e. Rê vedibe. Ev yek jî bi xebata gelê kurd çêbûye. Di gel van yekan, divê gelê kurd tu carî baweriya xwe bi wan neyne."

Osman Özçelik bi van daxuyaniyan nema û gote ew tiştên ku ji aliyê HEP, DEP û HA-DEP'ê ve dihatin gotin, êdî tene qebûlkirin û partiyên din jî wan tiştan dibêjin û diyar dikin ku divê êdî ew jî li ser meseleya kurdan û demokrasiyê tiştên nû bibêjin.

Her wiha Özçelik ragihand ku li Tirkiyeyê di payizê de ihtimala çêbûna hîlbijartineke giştî heye û heke şertên hîlbijartineke demokratîk bêne bicîhkirin wê bikevîne hîlbijartinê û di wî warî de têbikoşin.

ZANA FARQÎNÎ

Nameya YXK'yê ji Amerîkayê re

Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê (YXK) ji serokê Amerîkayê Bill Clinton û wezîrê derve Christopher re nameyek şand. Di nameyê de YXK'yê, jî berpîrsiyarên Amerîkayê daxwaz kirin ku ew rê li ber firotina bombeyên CBU-87 bigirin. Di nameyê de hate diyarkirin ku hemû sazî û şexsên kurd yên ku xwe berpîrsiyar dibînin, lazim e ew jî nameyên wiha bişînin. Nameya ku YXK'yê ji Clinton û Christopher re şandiye wiha dest pê dike: "Me nûçeyî firotina bombeyan ji çapemeniyê bihîst û em pê xemgîn bûn. Di nûçeyê de dihat gotin ku Fîrmaya Alliant Techsystems ya amerîkî, bombeyên ku bi hêzeke mezin diteqin, wê bifroşe Tirkiyeyê. Human Right Watch Arms Projecta Amerîkî, peymanî ku di navbera fîrmaya Amerîkî û

wezareta parastinê ya tirk de, di 21'ê pûşpera 1994'an de hatibû îmzekirin, bi civîneke çapemeniyê (di 28'ê berfanbara 1994'an) derxist holê.

Ji hêla din ve wê saziyê diyar kir ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dixwaze bombeyên CBU-87 bifroşe Tirkiyeyê.

Ji bo yekê wek Human Right Watch jî diyar kiriye, bombeyên CBU-87 wê li Kurdistanê, li hemberî mirovan, bajar, gundan û daristanan bêne bikaranîn.

Em ji we daxwaz dikin ku hûn van bombeyên CBU-87 ku bi hêzeke mezin diteqin û zirareke mezin didin derdora xwe, neşînin Tirkiyeyê û îxracata wan jî bisekinînin. Bi sekinandin û neşandina van bombeyan hûnê mirovên sivil jî kuştinê xelas bikin."

Enflasyon 1994; %150...



...KURTENŪÇE...

Aştî û şer di nav hev de

Şerê ku di navbera herdu hêzên Kurdistanê Başûr PDK û YNK ku demekê berê de sekinîbû, di 18'ê berfanbara '94'an de, dîsa dest pê kir. Di şer de nêzî 500 kesî mirine û bajarên Silêmaniyê û Hewlêrê ketine destê YNK'ê. Li gorî îdîjayan şer ji bo baca gumruka deriyê Xabûrê derketiye.

Dersên tarîxa Kurdistanê

Enstîtuya Rojhilata Navîn ya Moskovê, li gorî peymanê ku di 24-25'ê sermawezê de bi Enstîtuya Kurdî ya Berlînê re çêkiribû, dest bi dersên tarîxa Kurdistanê kir. Li gorî rayedarên Enstîtuyê, li hemberî dersan eleqeyê mezin heye.

Newroz dîsa derket

Rojnameya hefteyî Newrozê, dîsa dest bi weşanê kir. Rojnameya Newrozê, piştî bombekirina Özgür Ülkeyê, ji bo alîkariyê, weşana xwe sekinandibû. Hejmara Newrozê ya nû (43), ji aliyê serdozger ve hate berhevkerin.

Weşana Realite Press'ê sekinî

Rojnameya hefteyî Realite Press, di serê sala nû de weşana xwe sekinand. Li gorî Berpirsiyarê Nivîsaran Mahfuz Sürgit, ji ber problemên belavkirinê wan ev biryar standiye. Realite Press, di 30'yê sermawezê de derket û bi kurdî-tirkî bû.

DEP di roja dinyayê de

Li ser daxwaza DEP'ê, serokê Yekîtiya Parlemantoyên Dinyayê (YPD) Josi J. Meier hat Tirkîyeyê û bi serokê meclîsa tirk Hüsametîn Cindoruk re hevdîtinek çêkir. Meier got ku, endîşeya wan ev e ku li Tirkîyeyê herêmek di meclîsê de nayê temsîlkerin.

95 jî li TL'yê nehat


Di 95'an de TL (lîrayê tirk) û borsaya, li hemberî Dolar û Mark ketin. Li gorî agahiyan enflasyona 95'an wê bigihîje %150. Ji niha ve Dolarek bû 41 hezar û Mark jî bû 26 hezar. Dolar, di 1924'an de bi 90 qurîşê tirk bû. Yanî li hemberî TL'yê jî % 45.221 zêde bûye.

'EM JI RÊ DERNAKEVIN'

Destpêkên cihêreng

Yakîtiya Xwendekarên Kurdistan (YXK) di 4'ê vê mehê de ji serokê Amerîkayê Bill Clinton û Wezîrê Karê Derve Christopher re nameyek şand. Human Right Watch ya amerîkî, di 28'ê berfanbarê (meha 12) de peymanê firotina van çekan derxistibû holê û ji Kongreya Amerîkayê re nameyek şandibû. Bi xêra vê saziyê vê gavê rêveberiya Amerîkayê firotina hin çekan sekinandiye. YXK jî, di vê çarçeweyê de ji berpirsiyarên Amerîkayê re nameyan dişîne û dixwaze livbaziyê herêketê wisa dest pê bike. Belkî tesîreke vê livbaziye li ser firotina van çekan çênebe, lê encam û herêket muhîm e. Kurd, bi bûyerên wiha wê hêz û yekîtiya reaksiyonên xwe nîşanî hem dost û hem jî dijminên xwe bidin. Jixwe ne hewce ye ku mirov ji xwendekar an jî ji xwende û rewşenbîrên kurdan re bibêje, divê ew nameyan bişînin. Destpêkên wisa cihêreng, wê riyên nû li ber kurdan vekin, serê wan bi awayekî erênî (pozîtîf) biguherînin û belkî jî cesareta medenî ya kurdan zêdetir bikin.

Endamê HADEP'ê Edeneyê Haci Sait Macir (47), ji aliyê kontrayan ve hate kuştin. Haci Sait Macir, di 28.12.1994'an de li ber deriyê dikana xwe, ji aliyê du kesan ve hate gulebarankirin. Di vê bûyerê de Haci Sait, ji serê xwe hatibû birindarkirin û 4 rojan li nexweşxaneyê di sêkiratê de mabû. Haci Sait, di 01.1.1995'an de ji ber birina xwe mir.



Haci Sait Macir

Cenaze di 02.01.1995'an de bi beşdariya 2 hezar kesî bi sloganên "Bimre kontra", "Bijî bratiya gelan" û "Şehîd namirin" hate veşartin. Di cenaze de serokê HADEP'ê Edenê A. Samet Yaman, li ser êrişên wiha

peyivî û ev got: "Failê vê cinayetê ne meçhûl e. Lê bila ew zanibin ku em tu car jî rê dernakevin." Endamê meclîsa HADEP'ê Musa Kulu jî axaftinek kir û wiha got: "Heta niha me

90 şehîd dan. Haci Sait Macir ne şehîdê me yê ewil e û ne jî yê dawîn e, ewê herdem di dilê gelê xwe de bijî."

Li gorî agahiyan piştî belavbûna cenazeyê, du kes jî aliyê polisên sivil ve hatin binçavkirin.

Di cînyetên "Failê wan meçhûl" de heta vê gavê li Edene û navçeyên wê, serokek jî di nav de çar endamên HADEP'ê hatine kuştin. Di 28.09.1994'an de Salih Sabuktekin û di 03.10.1994'an de jî Rebiş Çabuk (sarokê HADEP'ê Yüreğir) û Sefer Cerf bûn hedefên êrişan.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ EDENE



Li Edeneyê gelê kurd li şehîdên xwe xwedî derdikeve

**Navên
10 kesên
xelatgirtî**

1. Hejar Kapazan
Fatih/Istanbul
2. **Yakup Tanış
Burdur**
3. Murat Aslan
Urfa
4. **Celil Akdoğan
Bağcılar/D.Bakır**
5. Zelal Öncül
Mardin
6. **Kazım Ekinci
Antalya**
7. İzzettin Oktay
Ankara
8. **Aziz Yıldız
Manisa**
9. Salih Güler
D.Bakır
10. **M.Hanifi Tek
İstanbul**

JÊRENOT

Pirtûkên ku me ji Abdülkerim Boran, Hasan Xelîl û Mehmet Aslan re şandibûn, li me vegeriyan. Ji kerema xwe re bila ew xwendevanên me li me bigerin an jî navnîşana xwe ya rast bişînin.

Ahmet Altan:

Em di nav çapemeniya tirk a virek de dema rastî çend nivîskarê ku destê xwe datînin ser wijdana xwe û dinivîsin, tèn pir kêfxweş dibin û dixwazin xwendevanên me jî van kesan nas bikin. Rojnamevanê meşhûr Ahmet Altan jî yek ji wan kesan e ku hewl dide bi awayekî objektîf binivîse. Em beşek ji vê nivîsa wî ya ku di quncikê wî yê Rojnameya Milliyetê de heftiya çûyî hatibû weşandin pêşkêşî we dikin.

Megolomaniyeke (dîniya xwemezinditîne) wisa bêwate (bêmane), xwe biçûkdîtîneke ne li cih, meraqa qehremaniyeke vitûvâla û paranoyayeke ku bi van tirsan xwedî bûye. Dema ew giş dikevin ser hev, civakeke ku gihan û mêjî tekilî hev e, li tu pîvanan nayê derdikeve holê. Em şaş dibin, nizanin ku em kî ne, em çi

Çi bextewar e, yê ku bibêje: 'Ez şîzofren im!'



Ne mutlu...

BÖYLESİNE manasız bir megalomani, böylesine yersiz bir aşâğılık kompleksi, böylesine de "federasyon da tartışılabilir" diyen başbakan-yardımcılarını çarşıya germeye kalkarız.

Ahmet Altan di nivîsên xwe de, zehf caran balê dikişîne ser talûkeya nijadperestiya rayedarên dewleta tirk.

ne. Ê ku dibêje: "Tirkek berdêli dinyayê ye" jî em in, ê ku dibêje: "Em nabin mirov" û ji bo da-leqandinê li werisê ingilizan digerin jî dîsa em in. Em bi çûyina heta ber deriyê Viyanayê pesnên xwe didin, lê ditirsin ku li bakurê Iraqê dewleteke kurdan ava bibe, wê Tirkiye pê parçe bibe. Em bi aqilmen-

diya xwe fortan didin, lê dîsa em bawer dikin, herkes, hergav dikare me bixapîne... Em dibêjin: "Li ser rûyê erdê tenê welatê misilman ê demokrat em in" pişt re, gotinên wekî: "Em rê nadin ku demokrasî welatê me parçe bike." dibêjin... Li Bulgaristanê ji bo ku tirk bi tirkî perwerde bibin, em dinyayê radi-

kin ser piyan, lê taha-mûla me ji perwerdehiya bi kurdî re tune ye. Em bi şerê xwe yî rizgariyê serbilind in, lê, yewnan, ereb û bulgarên ku li dijî osmaniyan şerê rizgariyê dane, em wek xayîn bi nav dikin. Li Qibrîsê jî bo tirkên ku hindikahî ne em federasyonê dixwazin, lê dema (ji bo kurdan) cîgirê serokwezîrê

dibêje: "Divê fikra federasyonê bê munaqesekirin" em dixwazin wî li çarmixê bidin. Em li kevir û kuçeyan dinivîsin: "Çi bextewar e, yê ku dibêje: 'Ez tirk im' lê dema yek bibêje: 'Çi bextewar e, yê ku bibêje: 'Ez alman im', 'Ez fransîz im, 'Ez kurd im' di cih de em wî wek nijadperest bi nav dikin. Em tim qala bêhnfirehiyê dikin, lê dema yek rexneyê li me bigire, he-ma em bawer dikin ku ew "dijminê tirkan" e. Ev hemû siyên civakê ne. Civaka ku tahamûla wê ji gotina: "Çi bextewar e, yê ku dibêje: "Ez hemwelatîyê Tirkiyeyê me" re tune ye û dixwaze bi şer û pevçûnê, bi darê zorê bi mirovan bide zanîn ka ew wê bi çi bextewar bibin. Em çi bêjin... "Çi bextewar e, yê ku dibêje: 'Ez şîzofren im.'" **Werger: SOFİ HESENİ**


Xaçepirs bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinixînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tèn belavkirin. Xelata vê heftiyê pirtûka **Jan Dost "Kela Dimdimê"** ye. Peyva veşarî ya xaçepirsa hejmarê 6'an: **MemûZîn**. **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nav qutiyên li bin xaçepirsê binivîsînin û ji me re bişînin.

Xelata Xaçepirsê

"Kela Dimdimê"
Jan Dost

X A Ç E P I R S A B I X E L A T

Hedef	Derman	12	Merşa neteweyî	Mehlûqa-teke xeyalî	Ekserî	10	Herêmek ku lê qetlîamek pêk hatibû
Di wêneyê de tê dîtin	Qaf	3	Sembola Neonê		Partiya ku hate girtin		
Hêvî				Col			9
Navek			Cînavkek		Kaş		
			Giyayek		Rewşenî		
Sembola Nîkelê		6	Pivaneke ji bo erdê				
Sembola Aktînyûmê			Dema piştî esrê		Qertafeke neyîniyê		
	Ji vir û pê ve			1	Qêrna dewaran		5
	Deng				Enstrûmanek		
Cihê mîşên hingivîn	Lêkirin	13			7		
	Olan						
				Bi rûskî 'erê'			
				Qesela hûrkîrî			
Bi baranê re şîn dibe		8			Sembola Hidrojenê	2	
Cihê bexikan							
			Jêderka avê				11



AGAHIYÊN ABONETIYÊ
Min Welatê Me divê

- | | | |
|---------------------------------|---|---|
| <input type="checkbox"/> 3 Meh | <input type="checkbox"/> Li Hundir 400.000 TL | <input type="checkbox"/> Li Derve 30 DM |
| <input type="checkbox"/> 6 Meh | <input type="checkbox"/> 800.000 TL | <input type="checkbox"/> 60 DM |
| <input type="checkbox"/> 12 Meh | <input type="checkbox"/> 1.600.000 TL | <input type="checkbox"/> 120 DM |

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV :
NAVNÎŞAN :

Navnîşana Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel-Fax: 2491344 – 245 29 91

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13

WELATÊ ME


Mesaja ku qumandanê EZLN'ê ji serokê Meksîka re şand:

'Tu bi xêr hatî nava kabûsê'

Krîza aborî ya ku bi daketina hêjahiya pezoyê xwe da der, rastiyeke din derxist holê: Rêveberiya Meksîkayê divê bi EZLN'ê re li hev were. Ji ber ku sermayedar naxwazin pereyên xwe li wêlatekî di nava şer de bi kar bînin. Li aliyê din pêkanîna daxwazên Zapatîstan ên ku nasnekirina mafên xwecihan, parvekirina dewlemendiyê û betalîkirina NAFTA'yê ji bo wan ne gengaz e.

Li Meksîkayê dema roja 1'ê berfanbara 1994'an Serokê nû Ernesto Zedillo Wezîfe wergirt, mesajek jê re hat. Ev mesaj ji yên din cihêrengtir bû, ji komandanê EZLN'ê (Eniya Rizgariya Neteweyî ya Zapatîstan) Marcos hatibû, wî digot: "Tu xêr hatî nava kabûsê"

Ernesto Zedillo zêde li ser wê mesajê nese kinî, lê wateya wê piştî demekê derket holê, xwecihan ku l'ê rêbendana sala çûyî li Chiapasê serî hildabû, di salvegera yekemîn de hinek êrişên nû pêkanîna û gelek gund û girên nêzî wargehê xwe bi dest



Xizan dixwazin ku dewlemendî bê parvekirin.

xistin. Wan di gel gundiyan salvegera serhildanê pîroz dikir. Ji ber rewşa bêewleyî di nava rojekêde nêzî 1 milyar dolarê Amerîkayê ji Meksîkayê vekişî.

Derbeya rastîn li dû vê hat. Pereyê Meksîkayê pêşî %12 hêjahiya xwe winda kir, pişt re jî ev daketina hêjahiya pezoyê gihîşt %40'î. Ew welatê ku bi Amerîka, Kanadayê re peymanana NAFTA'yê (Peymana Bazirganiya Serbest ya Bakurê Amerîkayê) mor kiribû û ji aliyê aborî ve wek wêlatekî biistîkrar dihat pêşkêşkirin noqî nav krîzeke nû dibû.

Ji bo ku ji vê krîzê rizgar bibe Zedillo, planeke nû amade kir. Li gorî vê planê wê Amerîka, Kanada, îspanya û hinek welatên din ji bo ku îtibara wê bilind bikin 18 milyar dolarî wek kredî bidin Meksîkayê. Li hundir jî li ser hinek tedbîran, nûnerên karsaz û sendîka û hikûmetê li hev kirin: wê

karsaz zemê nekin (ji bilî malên hawirdî -ji derve anî), hikûmet ji karsazan hindik bacê bistîne, mehmiza (maaş) karkeran wê ji bo 1995'an tenê %4 zêde bibe li gorî texmînan (enlasyon ji sedî 20'an ne hindiktir be). Hikûmetê daxuyand ku wê riya hesînî, balafirgeh û li-manan arizî bike an ku bifoşe.

Artêşê dor li serhildêran girt û Sarokomar Zedillo, pişt re daxuyand ku ev daxwaza EZLN'ê ya ji bo lihevrûniştinê nû qebûl dîke. Lê heta mafê xwecihan yê neteweyî neyên nasîn û serweta heyî li xizanên Meksîkayê neyê parvekirin kabûs xelas nabe.

SAMÎ BERBANG

Daketina hêjahiya pezoyê îtibara Serokomarê nû Ernesto Zedillo jî daxist.



EZLN salvegera serhildana xwe bi êrişên nû pîroz dikin.

Dawiya dîrokê

Di sersalê de rengên kesk û sor û zer hewayê serbajêrên Ewropayê xemilandibûn. Zikên tije çavên xwe dabûn asîmanê listîna raketên Çînê, hatina şadiyên sala nû pîroz dikirin. Li dinyayeke biçûk kêf û şahî wekî avê diherikiyan. Kenînekê dilên mirovên leşkerî û nexweşên hêze girtibû. Li "hunera" xwe dinêriyan, ji xwe ve diçûn. Ev dinya dinyayeke spî bû. Endamên wê ji 3'yan yekê 7 milyar mirovî bûn. Lê ji tevayîya dewlemendiya erdê ji çaran sisê di destê wan de bû. Dixwestin bi projeyên nû wê zêdetir bikin. Agahî li tanq û balefiran bar dikirin, dişandin derên din ku hevalbendên wan amade bin. Dizanibûn ku kontrolkirina dewlemendiyê ne hêsane. Ji ber ku didîtin dem diguhere, tehemula giruşyên zikbirçî nedima. Di vê eniyê de xizaniyê dabû qirikê. Dikaribû di her kêliyê de wekî bombeyekê biteqe. Îro nebe çend salê din. Dema împaratora mezin ji hev çûbû cardin ketibûn kolanan, serpêhatî pîroz kiribûn. Li gorî xwe wan serê cenawirê mezin jêkiribû. Dawiya dîrokê hatibû. Dubendî nemabû, mêzik pêk hatibû. Êdî kesekî nedikaribû serî li ber xwe rake, dev bavêje rehetiya wan. Hingê kêfê kêfa wan bû, sendroma tirs û xofê ji holê rabûbû... Lê çi feyde... Zikên birçî her ku diçin zêde dibin. Xwendîna wan jî zêde dibe. Hişê wan fireh dibe, dizanin ku kî xwarina wan didize. Têdigihîn, ku komek hindekahî çawa di seltenetê de dijîn. Bêkartî û xizaniya wan jî siûda wan dîke yek. Teknolojiya datayê jî dikeve destê wan. Wê çaxê ew dikarin bombeyê atomî jî çêkin. Ev rastî ye ku di serê rêbendanê de di dilên xwedî seltenetê de xofê diafirîne. Bêyî tişteki êdî Seda Çînê jî nikare rê ji vê xofê bigire. An dewlemendî tê parvekirin û maf tîndayî an jî sendroma xofan didome.

MEMO DARRÊZ



FAL



BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Ji dest nayê ku mirov ji kesên wek we re bibêje serhişk. Gelek caran peyv di serê we de naçin. Hûn carinan dikevin înadê, tiştêkî qebûl nakin. Ji bîr nekin serhişkiyek bi xwe re serhişkiyek din tîne.



GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Hûn xwe carinan dixin îyarê xwe û bala xwe nadin tiştêkî din. Hevalên we yê nêzîkî we jî dibe ku neyên bîra we. Van rojan xwe ji cihê xwe hinekî tev bidin, bala xwe jî bidin derdora xwe.



CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Gazînen ku hûn dikin, gelek ji wan di cih de ne, lê her gav derdora xwe sûcdar nekin. Dibe ku qisûrên we jî hebî. Çare: Bila her gav bala we li fala we be, belkî mûcîzeyek xwe rêyî we bide, ma kî zane?!



KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Baş e ku li ser rûyê erdê însanên wek we hene, an na wê halê dinyayê çawa bibûya? Bi xêra hesabên we, din ya birçî namîne. Qîma we nayê ku hûn pariyekî nan jî biavêjin. Tese-ruf ji îmanê tê.



ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Heke bêhtengiyek bi we re hebe, hiç nesekinin û xwe berî nava însanan bidin. Bigerin, li bin baranê û berfê, hiç ne muhîm e, heta hûn betilîn û acizbûn bigerin. Gava bû êvar jî xwe biavêjin nav nivînan û razên, şevbaş.



SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Çavtengiya we, di nav hevalên we de îtibara we kêmkê. Belkî hûn ne di ferqa vî xuyên xwe de ne, lê ev halê we ji aliyê derdora we ve tê dîtin û nayê ecibandin. Hinekî jî çavfirehiyê biceribînin, bê ka wê halê dinyayê çawa bibê!



MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Meraqa we ya xwendinê hingî pir e, ku bi ya we be hûnê kitabên ku tene firotin gişan bikirin û mala xwe bikin kitabxane. Hûn hiç fikirîne ku li kitabxaneyekê bibin wezîfedar?



DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Di van rojên dawîn de dibe hinek doza zewacê li we bikin. Gelek caran jî we mecbûrî qerardayîne dikin. Lê divê hûn qerara xwe li gorî xwe bidin. Ji ber ku di dawîya karên wiha de yê ku bextiyar bibê jî, yê ku poşman bibê jî, hûn in.



KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Hêviyên we pir in. Doza ku hûn li pey in nerast be jî, hûn ji bawerîya xwe tiştêkî wînda nakin. Ev jî nîşan dide ku xeyalên we pir mezin in. Riya we rast e, dewam bikin.



KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Di vê sersalê de hûn wek însanên din ne xeyalperest in. Her çiqas hûn carinan dixwazin bibin însanên melankolîk jî, ev tişt li we nayê. Ya baş, hûn dîsa vegezin ser rastiya xwe.



DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Hûn gelek caran ihtiyaca guherînan dibînin. Ji bo guherînan hûn dikarin lêkolîn û lêgerînan jî bikin. Lê çî heft e ku hûn ji bo guherînan tiştêkî nakin û dixwazin kesên din vî karî bikin.



MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)

Di van hefteyên nêzîk de riya xerîbiyê ji bo we dixuye. Kesek nizane bê wê bi awayekî baş an xerab bibê, lê te-bîeta we jî tiştên wiha re nexerîb e. Belkî riya xerîbiyê ji bo we bibê riya hêviyên nû.



Binêre Qeymeqam Beg

Rojeke yekî gundî, karê wî li qezayê çêdibe. Berê xwe dide diçe qeymeqamtiyê. Gundiyê me jî baş bi tirkî nizane. Bi saya katibê qeymeqam derdê xwe dide fêmkirin. Qeymeqam gundî dide rûniştin, çayê jê re dixwaze. Karê wî di navbera çend deqîqeyan de diqedînin.

Gava gundî, diçe gundê xwe zêhf pesnên qeymeqam dide. Qala çeyî û qenciya wî dibe û dibêje: "Nabe, gerek e ez di binê vî qenciya qeymeqam de nemînim." Her kesek tiştêkî dibêje. Di da-

wiyê de qerar dide ku ji qeymeqamê qezayê re satilek mast bibê. Satilek mast ji şîrê mihan dimehîne.

Serê sibehê dikeve riya qezayê û diçe mala qeymeqam. Li deriyê wî dide. Qeymeqam tevî pîreka xwe dertê ber derî. Qeymeqam dibîne ku gundiya wê rojê ye. Satila mast ji destê wî distîne. Çend gotinên bi tirkî ji gundî re dibêje, lê gundî fêm nake. Bi tenê gotina qeymeqam a "çok çok teşekkür ederim" (Ez pir spas dikim) di hişê wî de dimîne.

Diçe sükê, ku maneya wan gotinan

hîn bibê. Rastî mirovekî qezayê ku bi henekên xwe nav daye, tê. Gundî, ji wî yê henekvan re dibêje ku qeymeqam ji wî re gotiye; "çok, çok teşekkür ederim!?"

Kesê henekvan berê xwe dide gundî û jê re dibêje: "Te qet tiştêk jê re ne got?"


Gundî: "Na! Ma çima?"

Henekvan: "De here lo, mirov dibêje qey tu jî zilam î. Ma te ji simbelê ber pozê xwe jî fedî nekîr? Tu zanî qeymeqam ji te re çî gotiye he? Gotiye: 'Ezê te pir pir ga bidim.' Te çawa bersivê wî neda? De here ku hîn kesî nebi-

histiye. Te em rezîl kirin." Gava gundî van gotinan ji yê henekvan dibihîze, rû lê sor dibe, bi hêrseke mezin, vedigere mala qeymeqamê. Bi wê hêrsê li derî dixê. Qeymeqam dîsa tevî pîreka xwe derî lê vedike. Bala xwe didîne ku gundiya berê ye. Qeymeqam hê xwe hazir nekiriye ku bibêje: "Xêr e, tu çî dixwazî?" gundiya me dest pê dibe û dibêje:

Binêre qeymeqam beg, ez te, jina te, zarokên te û hemû silala te "çok çok teşekkür ederim." Te fêm kir?!

MEDİ



Piştî 16 salên din li ser Meraşê nivîsarek derengmayî

ÇI HEYF E KU ÊŞ TÊN JIBÎRKIRIN

DIK

Sendroma Şerê Kendavê

Revêberiya Dewletên Yekbûyî yê Amerikayê (DYA) piştî sendroma Vietnamê, sendroma Şerê Kendavê jî nas kir. Li gorî nivîseke ku di kovara The Middle East'ê, hejmara rêbandanê de derket, rayedarên DYA ji bo ku nexweşiyên beşdarên "Operasyona Bagerê Çolê" tedawî bikin 30 milyon dolar veqetandine.

Ji 700 hezar kesên ku beşdarî şer bûne, 45 hezar kesî heta niha serî li sazîyên tenduristî daye. Li wan kesan nişanên hinek nexweşiyên wek: porweşîn, qelsbûna hefizyê, bêhngîkî, zûwestîn, zehf kîlodayîn, enfeksiyon û qelsbûna sîstema berxwedana xwezayî ya li dijî nexweşiyên, hatiye dîtin.

Meclîsa Nûneran ya DYA'yê sala çûyî biryar da ku ji bo tedawiya wan kesan 30 milyon dolar bê veqetandin, Bill Clinton jî destek da vê projeyê. Lê, zirardîtiyên brîtanî qasî yê amerîkî ne bişens bûn. Serîlêdana 45 hezar kesên brîtanî ji aliyê rayedarên dewletê ve hat redkirin. Tê îdîakirin ku ew nexweşî ji ber îlacên ku leşkeran berî şer bi kar anîne, çê bûne. Leşkeran ji bo ku xwe ji tesîra dûmanên kîmyewî û biyolojîk biparêzin hinek derman bir kar anî bûn. Zanyarên Amerîkî gelek sedemên din jî nişan didin. Dibêjin ku, dûmanê jehrî, bakteriyên harêmî, jehra kîzikan, çekên kîmyewî û hebên sinîrê yê belîsans bûne sedema van nexweşiyên.

Tîrsa wan ev e ku nexweşî derbasî zarokên nexweşan jî bibin. Dr. Ellen Silbergeldê di axaftina xwe ya ku gelaweja (meha 9'an) sala çûyî li kongreyê kir de wiha digot: "Em dizanin ku bandora dûmanên jehrî derbasî zarokên kesên ku berê di bin bandora wî dûmanî de mane jî dibe." Dîsa wê got ku ew nizanîne ka ewê li hemberî wê yekê çî bikin. Li gorî lêkolîneke ku Fîzîkvanê Amerîkî Dr. Francis Waickman kiriye, Zarokên anormal li gorî kesên ku beşdar nebûne, ji sedî 30 hîn zêdetir ji kesên ku tevî şer bûne çêdibine.

25 ARALIK 1978

KAHRAMANMARAŞ'TA OLAYLAR BÖYLE BASTIRILDI



Annesini sırtında hastaneye taşıdı

Saldırganlar, kadının çocuk yaşta genç zemedan önlere getirdi öldürmüştü veya yaralamıştı. Yaralılarından bir bölümünü de yakınlarda hastanelere getirmişti. Fotoğrafta taşıdığı bulamadığı için yaralı anasını sırtına alıp hastaneye getiren bir genç görülmüştür.



Komşu illerden gelen askerî birlikler herriken kendilerine verilen emir gereğince özerklik kaygıları tuttular. Kahramanmaraş'ta dün ögleden sonra askerînin sağlanmasında bu birliklerin çabaları büyük ölçüde rol oynadı.

SALDIRGANLAR DURDURULUYOR

Başlıca evlilerden bazıları dün çeşitli gösteriler ve saldırılar düzenlediler. Ancak tüm bu saldırılar kent içinde görev yapmakta olan askerî birlikler tarafından durduruldu; Fotoğrafta, saldırıları önlemek için harekete geçen bir birlik görülmüştür.

dünyaya bir kere gelinir

Li Meraşê qetliama ku bi destê faşîstan çêbû, ji generalan re bû hincet ku derbeyê bikin.

Qeyd bikin, her tiştî, her gavê, her rojê, her mehê, her salê û sed-salê, bi kurtasî her tiştî. Daweşînin ser rûpelan bila bibin belgeyên dîrokî.

Bila her kes qeyd bike, çî zarok, çî ciwan û çî pîr û kal. Qeyd bikin ku kesên din dîroka we nenivîsin, da ku zarokên we dîroka xwe ji xelkê hîn nebin.

Li ser rûye erdê, yê ku pêserojê qut dîkin, ew kes in ku tiştan qeyd nakin. Bi gotîneke din, ew kes in ku karê qeydkirina dîrokê ji kesên din re dihêlin.

Niha gelek bi bîr neynin ku ew zalimên ku qetliaman dîkin, di nava me de hîn jî ji xwe re digerin. Ji bo nîmûne, li gorî daxuyaniyên fermî kuştîyên qetliama Meraşê 111 kes in, lê di vê bûyera ku 15 salî berî wê qewimî de hejmara kuştîyan bi sedan in. Ji ber neqeydkirinê, hejmara rast a kuştîyan nayê

Her çiqas ev qetliam bi destê rêxistinên nijadperest: MHP'ê (Partiya Tevgerê ya Netewekar) û şaxa ciwanan a vê partiyê ÜGD'ê çêbû jî berpirsiyarên qetliamê yê rasteqîn sermayedarên tirk bûn. Qetliam bi ezimandina wan çêbû.

zanîn.

Qetliyama Meraşê di 19.12.1978'an de bi dînatmîtkirina "Çiçek Sinemasi" dest pê dîke. Armanca qetliamê ji navê rakirina alewîyan- bi taybetî yê kurd- û muxalefeta çepgir bû. Di nava şer rojan de bi sedan du-kan û malên li nava

bajêr hatine şewitandin û rûxandin. Bi sedan jî mirov bi awayekî hovane hatin kuştin.

Mebûsê Meraşê yê ji BBP'ê (Partiya Yekitiya Mezin) Ökkeş Kenger ku paşnavê xwe wek Şendiller guhert bersûcê yekemîn yê qetlimê bû, lê ew niha li meclîsê ye. Ji bilî wî Serokê ÜGD'ê (Komela Ciwanên Armanmend) Mehmet Leblebici û Cîgirê wî Mustafa Kanlıdere jî du kesên kujyar in.

Her çiqas ev qetliam bi destê rêxistinên nijadperest: MHP'ê (Partiya Tevgerê ya Netewekar) û şaxa Ciwanan a vê partiyê ÜGD'ê çêbû jî berpirsiyarên qetliamê yê rasteqîn sermayedarên tirk bûn. Qetliam bi ezimandina wan çêbû.

Provokatorên ku ji sinemayê derketin serê pêşîn avahiya CHP'ê (Partiya Komarê ya Gel) û PTT wêran kirin. Di 20'ê mehê de wan qehwexaneyê "A-

kın" bombe kir. Di 21'ê mehê de wan du mamostayên endamê TÖB-DER'ê (Komela Yekitiya Mamosteyên Tirkîyeyê) bi navê Hacı Çolak û Mustafa Yüzbaşoğulları kuştin. Faşîstan di 22'yê mehê de êrîş birin ser merasîma cenazeyên wan her du mamosteyan û sê mamosteyên din kuştin.

Di 23'yê mehê de bûyer gihîştin radeyêke bilind. Êrîşên ku ji berê li hemberî alewî û çepgirîyan hatibûn plan- kirin, çêbûn. Faşîstan êrîş dibirin ser malên ji berê ve nişankirî. Mi-rov bi direndeyî û hovane dihatin kuştin. Zikên jinên ducanî dihatin qelaştin, zarokên ku hîn kêsek xwîn bûn li serê kêran dixistin. Tecawîzî keç û bûkan dikirin; serê pêsîrên wan jê dikirin; termên mirovan dişewitandin. Hêzên Dewletê, kesên ku xwe diavêtin bextê wan, bi şûn ve radestî faşîstan dikirin.

Ew bûyer hemû li

ber çavên hêzên ewle- kariyê qewimîn, wan destê xwe neda faşîs- tan. Hikûmeta Ecevit heta dawîya qetliamê bêtevger ma. Pişt re tevî hinek bajarên din li Meraşê Rêveberiya A- warte îlan kir, rê li ber cuntayê vekir.

Ev partiya faşîst ni- ha xwe wek partiyeke baş nişan dide. Gorê Boz helbestên Nazim Hikmet dixwîne. Lê li aliyekî bi destê timên taybet li Kurdistanê qetliamên hovane di- meşîne, li aliyê din li Tirkîyeyê amadekariya qetiliyamên mezîna di- ke.

Ev kirinên ku do li taxên Meraşê yek we- kî: Yörük Selim, Serin- tepe, Mağralı û Yeni- mahalleyê çêbûn, îro li ji aliyê tim, leşker û cerdevanan ve li Pasûr, Lîce, Şirnex Dêrsim û Nisêbinê pêk tînin. Ev dewleta destbixwîn jî hîn li ser kar e.

Çi heyf ku êş û janên berê tene jibîrkirin.

ESNAS MAYA

Mebûsê kurd ê Dêrsimê Sinan Yerlikaya ku hê jî di nav SHP'ê de ye ji bo Welatê Me axivî:

ÊDÎ DEWLET JÎ ŞEWITANDINA GUNDAN ÎNKAR NAKE

BÊQERARIYA YERLIKAYA

Di meha bihurî de Sinan yerlikaya di rojeva çapemeniya Tirkiyeyê de bû. Ev mebûsê Dêrsimê ku heta hingê çapemeniya tirk behsa wî nedikir û di raya giştî de jî zêde nedihate nasîn, bi tewra xwe ya li hemberî şewitandina gundên Dêrsimê jî nişka ve derkete pêş. Her çi qas Yerlikaya jî aliyê hin derdorên derveyî meclîsê û rêxistinên şoreşger ve mîna dijberê demokrasîyê bête suçdarkirin jî, li aliyê din jî ber ku wî li hemberî şewitandina gundan rexne li dewletê girtin û got ku gundên Dêrsimê jî aliyê hêzên dewleta tirk ve hatine şewitandin, bû hedefa êrişên alîgirên dewletê. Bi kurtî ew di navbera dêrê û mizgeftê de ma; hem têkiliyên wî, piştî vê tewrê, bi partiya wî re, ku şîrikê hikûmetê bû, hinekî xerabûn, hem jî ji ber ku ji SHP'ê venediqetiya, ji aliyê der-

dorên şoreşger ve mîna zilamê dewletê dihate suçdarkirin. Ji gotinên Yerlikaya em wisa fêmdikin ku her çendî ew jî siyaseta hikûmet û dewleta tirk ne memnûn be û zêde jî dewletê nebihêvî jî be, di wê baweriyê de ye ku mumkun e bi destê dewletê problema kurdan bête çareserkin. Bi kurtî Yerlikaya hinek jî bêqerar e. Ne dixwaze bi temamî bibe zilamê dewletê, ne jî dixwaze bibe dijber û hedefa dewletê. Me jî xwest em rasterast ji devê Sinan Yerlikaya tewr û dîtînen wî hîn bibin û bi kurdî gotinên wî pêşkêşî xwendevanên xwe bikin. Yerlikaya jî zaravayên kurdî bi kirdkî (zazakî) dizane û dixwest bi kirdkî bi nûçevanê me yê Enqerê Jêhat Serheng re bipeyive lê mixabin nûçevanê me bi kirdkî nizane, ji ber vê yekî wî pê re bi tirkî xeber da û paşî wergerande kurmançî.

Birêz Sinan Yerlikaya, li gorî dîtina me tiştên ku hûn dixwazin bibêjin, li ber televîzyonan û di rojnameyan de hûn derfetê nabînin binin zimên. Sebebê vê yekê çi ye?

- Pêşî divê ez bibêjim ku di rojên bihurî de ew programa ATV'yê ya ku li ser pîrsgirêka kurdî hate çêkirin, gaveke baş bû. Ev cara yekemîn bû ku li ser tiştêkî wiha girîng di televîzyonê de dihat axaftin. Axaftina li ser gelsa kurdî, di navbera endamên partiyan, ronakbîran de li gorî min zehf baş bû. Em jî hem wek partî û hem jî wek endamêkî SHP'ê dixwazin ku li ser vê meseleyê muneqşe û vekolîn çêbibin.

Hûn dîzanin ku ev demeke dirêj e li welatê me şerekî mezin heye û ev şer pîrsgirêka me hemûyan e. Lewra welatê me jî ber vî şerî ne ji aliyê siyasî, ekonomîk û ne jî ji aliyê sosyal ve bi pêş ve diçe. Ji ber vê yekê jî, em dixwazin ev mesele di nava sînoren demokrasîyê de, li nav sînoren vê dewletê bêne


çareserkin.

Dema behsa kurdan tê kirin, zehf kes ditirsîn û dibêjin: "Hûn behsa dewleteke serbixwe dikin." Lê em dîzanin incex bi çareserkirina vê pîrsê ev gel û ev dewlet dikarin bi pêş ve herin. Tu çareyên din tune ne.

Dema em behsa vê meseleyê û behsa mafên gelê kurdî dikin, PKK'ê datînin ber me. Lê, li gorî bawerîya me ev her du mesele jî hev û din cihê ne. Divê PKK û doza mafên kurdan jî hev bêne veqetandin. Em dibêjin ku PKK hebe jî tunebe jî ev pîrsgirêk heye û divê li ser bête axaftin.

Berî du mehan dema ku gundên li Kurdistanê hatin şewitandin hûn derketin û we got: "Dewlet gundan dişewitîne." Serokên hemû partiyan û siyasiyên din derketin, bi rojan demec dan û xwestin we derewîn derxin. Li ser vê bûyerê hûn dixwazin çi bibêjin?

- Belê, tiştê ku bi serê mirovên min, gundiyên min û welatîyên min de hatibûn, min eşkere



gotin û anîn holê. Îro êdî dewlet jî şewitandina gundan înkâr nake. Wezîrê hundurîn dibêje "ev yek jî xwezaya bûyerê ye". Min mucadelên mezin di vê meseleyê de dan. Me ev yek di serê meseleyê de jî gotibû. Hin hevalan jî behsa valakirin û şewitandina gundan kiribûn. Lê mixabin tu deng jî vê hewl-dana wan derneket. Ordîyê di bihara bihurî de bi operasyonê mezin dest avête Dêrsimê. Em nabêjin bila ordî dernekeve operasyonan lê divê hemû tişt di nava hiqûqê de be. Lê ordîyê di van oprasyonan de, li "Tuncelî"yê ne guh da

hiqûqê, ne wîjdanê û ne jî însaniyetê. Gelo ev kirin çi bûn? Cara ewilî gundên li daristanê, bi îddîaya ku alîkarî didan PKK'ê, ji xarîteyê hatin rakirin. Mesela gundên Pûlûrê (Ovacık) hatin şewitandin. Cara pêşî bi awayekî veşarî li vir 17 gund hatin şewitandin. Paşê nava rojê leşker çûn û şewitandin. Gelek jî bi eşyayên xwe ve hatin şewitandin. Di wan operasyonan de helikopter hatin bikaranîn. Muxtar û gelê wê derê çalidên vê yekê ne. Dewlet dibêje PKK'ê ev der şewitandine. Em bibêjin yek an du gund ji alî PKK'ê ve hatin şewi-

tandin, ê baş e gundên din çawa hatin şewitandin? Ev ne mumkun e. Em dîzanin helikopterên PKK'ê tune ne. Muxtarên me hatin Enqereyê ev bûyer jî T. Çiller re gotin. Çiller'ê, îddîa kir ku şewitandina gundan ji aliyê PKK'ê ve hatine kirin. Ya dudoyan hewcedariya PKK'ê bi şewitandina gundan tune; lewra bi çi tewrî be alîkariyê ji wan gundan distîne.

Li ser van gotinên we mirov dibêje qey hûn endamê partiyek muxalefetê ne. Lê hûn li iqtîdarê ne. Hûn çawa nikarin pêşiyê li van bûyeran bigirin?

Dema em behsa vê meseleyê û behsa mafên gelê kurdî dikin, PKK'ê datînin ber me. Lê, li gorî bawerîya me ev her du mesele jî hev û din cihê ne. Divê PKK û doza mafên kurdan jî hev bêne veqetandin. Em dibêjin ku PKK hebe jî tunebe jî ev pîrsgirêk heye û divê li ser bête axaftin.

Îro êdî dewlet jî şewitandina gundan înkâr nake. Wezîrê hundurîn dibêje "ev yek jî xwezaya bûyerê ye". Min mucadeleyên mezin di vê meseleyê de dan. Me ev yek di serê meseleyê de jî gotibû. Hin hevalan jî behsa valakirin û şewitandina gundan kiribûn. Lê mixabin tu deng ji vê hewldana wan derneket.



Gundiyan ku malên wan tên şewitandin dikevîne rewşeke pir dijwar.

- Dema em hatin îqtidarê, di protokola me ya koalîsyonê de zehf tiştên rind hebûn. Lê hûn dizanin ev welat ketiye rewşeke wisa ku hemû tişt bi PKK'ê ve hatine girêdan. Mafê mirovan, demokrasi, hiqûq hemû bi PKK'ê ve hatine girêdan. Em behsa çî bikin PKK'ê datînin ber me. Hemû kes zane tu eleqeya me bi PKK'ê re tune. Em dibêjin, ev

çend sal e li Tirkîyeyê mafên kurdan hene û van mafan divê bidîne wan. Ev çî ne; çanda xwe, zimanê xwe, folklorê xwe û heq û hiqûqên xwe yê din divê bistînin. Aborî jî gelek li paş maye. Me ji bo çareserkirina wan meseleyan, koalîsyon qebûl kiriye. Li gorî dîtina min di hinek tiştan de jî pêşveçûyîn qebûye. Lê tenê di şerê navbera PKK'ê û dew-

letê de welatîyên me hatine îhmalkirin. Hebûna me ya di nava hikûmetê de divê rê li ber behskirina çewtîyên politikayên dewletê negire.

Hemû kes dizanin di warê demokrasi û mafên mirovan de ne pêşveçûn, lê paşveçûn heye. Hûn qala kijan pêşveçûnan dikin?

- Eger niha pirsgerêka kurdî di nava gel de tê axaftin, di vê bûyerê de

hinek alîkariya me jî heye. Berê kesî nedikaribû bibêje: "Ez kurd im". Me hevalên ji DEP'ê di nava partiya xwe de anin parlamentoyê. Lewre bawerîya me ya bi demokrasiyê ev e. Piştî vê yekê li parlamentoyê li ser vê mijarê hate axaftin. Niha jî medyaya li serê diaxive. Li gorî min pêşveçûn ev e.

Xeberdan ji DEP'ê vebû. Hûn rewşa DEP'ê dizanin. Hûn bi çî çavî li vê bûyera DEP'ê dinêrin?

- Li gorî me ev tişt jî serî heta binî xelet in. Di serî de jî me got ku ev tiştên li DEP'ê tene kirin jî derî demokrasiyê ne. Divê axaftin hebe. Lê mixabin li Tirkîyeyê îro mafê axaftin û gotina fikran tune. Dema ev tune be jî wiha şer çêdibe. Yê li serê çîyan jî zarokên me ne, yê leşker in jî. Her du jî tene kuştin. Sebebê vê jî xebirnedan e. Divê Tirkîyeyê vê yekê ecele bîne çî, lê ez jî parlamentoyê ne hêvîdar im ku tiştê wiha bike.

Hûn bi çî çavî li meseleya kurdan dinêrin û mafên kurdan wê çawa bêne dayin?

- Ev meseleyeke hêsan e. Cara pêşîn divê bibêjim ku ez ne behsa dewleteke serbixwe dikim. Bikaranîna folklor, çand, hunera kurdan û

vekirina radyo, TV, enstitû û unîversîteyên bi kurdî, tê maneya nasîna nasnameya kurdî. Divê bi qasî tirkan, mafên kurdan jî hebin. Lewre wan ev dewlet bi hev û du re damezrandine. Zimanê kurdî divê bêta bikaranîn. Tirk jî divê vî zimanî hîn bibin. Ji aliyê aborî ve divê hinek tişt bêne kirin.

Têkiliyên we bi kurdî re çawa nin û hûn bi çî awayî li zimanê kurdî mêze dikin?

- Ez bi kirdkî (Dîmilî) dipeyivim. Lê kurdî demêke dirêj nehatiye bikaranîn, ji ber vê yekê jî, li paş maye. Dimiliya Palyoyê em car caran fêm nakin. Gelek derên din jî, dimiliya me fêm nakin. Lê ez baş dikarim bixwînim.

Der heqê dewlemendiya kurdî de dikarin çî bibêjin?

- Belê kurdî zimanekî pir dewlemend e. Di nav tirkî de gelek peyvên kurdî hene. Bi folklorê xwe jî gelek tesîr li ser folklorê tirkî kiriye. Kêm kêm hingî tirkî dewlemend e. Li gor dîtina min nêzikî fransîzî ye. Dema min li mektebê fransîzî didît, gelek caran min pêşî werger bi kurdî çêdikir, paşê dizivirand fransîzî.

**Hevpeyvîn:
JÊHAT SERHENG**



Gundekî ku ji aliyê dewletê ve hatiye şewitandin.

Li gelek deveran gerila û sermayê operasyona ku ji aliyê artêşa tirk ve hatin kirin, sekinandin.

29.12.1994

Gerilayan, li gelek deverên di navbera Sason û Pasûrê de kemîn danîn pêşiya leşkeran. Di kemînê de 5 leşker û gerilayek mirin.

Li çiyayê Gebarê, gerilayan avêt ser Tabûra Zeweyê. Di cerda gerilayan de, der heqê mirî û birindaran de saloxiyek nehate standin.

Gerilayên ARGK'ê, kesekî ji gundê Talatê yê Mêrdînê, kuştin. Hate gotin ku, wî ji dewletê re alîkarî û ajanî dikir.

Leşker û gerilayan li Rûbarê ku girêdahiye Amedê ye, li hev xistin. Di şer de 3 gerila mirin, der heqê zirara ku gihîştîye hêzên dewletê de tu agahî bi dest neketin.

Polisan girtin ser buroya Özgür Halk û NÇM'ê ya Amedê.

Li Stenbolê, li gelek deveran şaxên bankqeyên cur be cur hatin molotofkirin. Ev livbazî TKP/ ML TMLGB'yê hildan ser xwe.

30.12.1994

Di newala Cehnimê ya mintiqeya Mêrdînê de, leşker ketin kemîna gerilayan. Di vî kemînê de 10 leşker mirin.

Gerilayan li çola di navbera Farqînê û Pasûrê de êrişî leşkeran û cerdevanan kirin. Panzerek îhma bû, 4 leşker û gerilayek mirin, 4 leşker û 3 cerdevan jî birindar bûn.

Ji operasyonên li dorra Sasonê, hêzên dewletê gelek leşkerên birindar bi firokeyan dikişînin nexweşxaneyê Êlihê.

Gundê Karpikê ji aliyê hêzên dewletê ve hat şewitandin. Karpikê li ser Bismila Amedê ye.

Li Qubina Êlihê, li gundê Hidhidkê, gerilayên ARGK'ê, kemîn



Dewleta tirk di sala 94'an de ji bo ku di şer de biserkeve 400 trilyon TL xerç kir lê;

Di sersala 95'an de jî şer nesekinî

avêtin pêşiya erebeyekê. Di kemînê de 3 kes û gerilayek mirin. Tê gotin ku, kesên di erebeyê de, alîkariya dewletê dikirin.

Li gorî agahiyên Kurda'yê, hefteya borî gerilayan avêtiye ser gundê Talatê (Talatê giradahiye Mêrdînê ye). Di cerda gerilayan de ajanek û 6 leşker mirin e.

31.12.1994

Li Cûdî, 27'ê berfanbarê di navbera hêzên dewletê yê derketine operasyonê û hêzên ARGK'ê de şer derket. Di şer de 27 leşker û gerilayek mirin, gerilayek û gelek leşker birindar bûn. Gerilayan dest danî ser gelek malzemeyên cur be cur.

1.1.1995

Di 31'ê berfanbara

94'an de bi roj riya Dihê û Sêrtê ji aliyê gerilayan ve hate birin. Gerilayan di kontrolê de 2 erebeyên cerdevanan şewitandin.

Li paytexta Îngilistanê, kontrgerila êrişî Serokê Yollş'a DISK'ê yê berî 1980'yan û dostê kurdan Nafiz Bostanci kir.

2.1.1995

Sercerdevanê Eşîra Xêlî, Hamit Demir li Edene, li taxa Denizliyê hate kuştin. Hamit Demir ji gundê Sêmala Mûşê bû.

Gerilayan riya Sêrtê, li nêzikî gundê Hedid birin. Di kontrola rê de gerilayan 3 kesên lêzimên cerdevanan bi xwe re birin. Erebeke cerdevanên Reşana şewitandin.

Bombekirina Otela The Marmara İB-DA-C'yê hilda ser xwe. Di livbaziye de kesek miribû û 3 kes jî birindar bûbûn.

Li Amedê, li semta Koşuyolu, erebeya çawîşekî taybet, hate bombekirin.

3.1.1995

Li çiyayê Amanosê (Antakya) di navbera gerilayan û hêzên dewletê de şer derket. Der heqê mirî û birindaran

de salox neketin destê me.

Li Amedê, li Pasûrê gerilayan avêt ser cerdevanên gundê Şêxhemza. Di cerda gerilayan de 19 cerdevan û lêzimên wan û gerilayek mirin, 2 cerdevan birindar bûn. Gerila 7 cerdevan jî bi xwe re birin.

Di navbera Sêrtê û Dihê de leşker ketin kemîna gerilayan. Di kemînê de 27 leşker mirin û 5 leşker birindar bûn. 6 erebeyên leşkerî derbe xwarin, 3 erebe bi temamî îhma bûn.

Hêzên dewletê operasyonên li aliyê çiyayê Agirî û Tendüregê sekinandin. Li çola navbera Cizîra Botan û Hezêxê de gerila êrişî leşkeran kirin. 3 leşker mirin, 4 leşker jî birindar bûn.

4.1.1995

Timên taybet li gundê Eleziz Yixê, bi cilên gerilayan jî gundiyan bi zor pere top kirin.

Cerdavanê gundê Berzana Jorê, li koçerên Dûderan yê li mintiqaya Girê Kelo ne ji bo koçkin, li ser wana pêkutî dikin.

Gundê Amedê, Kerepeçyê, 27'ê berfanbarê

ji aliyên cerdevan û leşkeran ve hate şewitandin.

Ser cerdevanê gundê Darunisê yê Wanê, Hamit Kaplan mir. Halil Kaplan di teyara li ser wanê ketibû de birindar bûbû.

Li İzmirê, xwortekî kurd, ji bo şewitandina gundan û qetliemên dewletê protesto ke, ya xwe şewitand.

5.1.1995

Gundê Dêrsim'ê, dibin abluqeya hêzên dewletê dene. Ji ber abluqa qût gund bi giranê di ber sînora birçibunê de ne.

Li gundê Girqêhacifariz ya Bismilê, cerdevanan dest danî ser erdê gurdiyan.

Bombe li şubeya bankqeya Ziraatê ya semta Bağlar'a Amedê teqiya. Sê kes birindar bûn.

Li Edene, polisan avêt ser bûroyên rojnameyên, Jiyana Nû, Atılım, Kızılbaşrak û Özgür Halk'ê.

Nûneriya Ülkü Ocağiya Sefaköyê, hat bombekirin. Bi gorî agahiyên rojnameyan livbaziya endamên THK-FMK hildane ser xwe.

KURD-A
Navenda Nûçeyan

Protestoya zilma dewletê

Li İzmirê, li semta Bucayê, xortekî kurd xwe şewitand. Li gorî agahiyên Musa Aydın, ji bo protestokirina qetliamên li Kurdistanê xwe şewitandiyê.

Beriya livbaziya xwe Musa Aydın nameyek li dû xwe hiştîye. Aydın di nameya xwe de dibêje: "Ez li gelê xwe silavan dikim. Ez gerilayek im. Ji bo gelê xwe min têkoşîn kir. Li Kurdistanê gundê min tên xerakirin, şewitandin û însanên min tên kuştin. Ez siyaseta TC'yê ya şewitandina gundan û qetliaman protesto dikim. Ez vî livbaziye bi zanîn û xwestina xwe dikim." Li gorî şahidan Musa Aydın berî şewitandina xwe bî kurdî: "Em birçî dimînin, em tî dimînin, em tî kuştin" qîr dike û sloganên wek "Şehîdên Kurdistanê nemir in, Bijî Serok Apo" diavêje.

Ji Rojnameya Özgür Ülke

Li Edeneyê sercerdevanek hate kuştin

Li Edeneyê cerdevanekî bi navê xwe Hamit Demir (Hemîdo) hate kuştin. Kuştina Hamit Demir ERNK'ê hilda ser xwe. Hamit Demir sercerdevanê eşîreta Xelî, ji gundê Sêmalê ku girêdahiye Mûşê bû. Hamit Demir li Edeneyê taxa Denizliyê ji hêla ERNK'ê ve hate kuştin. ERNK'ê diyar kir ku Hamit Demir ji kuştina 39 kesan mesûl e. Berê ji kurê wî li Mûşê ji hêla gerilayên ARGK'ê ve hatibû kuştin. Tê diyarkirin ku Hamit Demir beriya demekê koçî Edeneyê bûye û mirovê eşîreta xwe bi zordariyê dibe gund û wan dike cerdevan.

Welatê Me / Edene

Li gundê Çilbê zilma polisan

Hêzên dewletê wekî hemû gundên Kurdistanê li gundê Çilbê ku bi Amedê ve giradayî ye li gundiyan zilmê dikin. Li gorî agahiyên ku ketin destê me, polis li vî gundî bêsedem gundiyan digirin û li wan îşkenceyê dikin. Malbatên ku pêkutî li wan hatine kirin ev in: Malbata M.Emin Aslan, Şeyhmus Gün, Osman Yaşar, Mehmet Karakuş, M.Hatip Gündoğdu û malbata Mehmet Çalan. Li gorî agahiyên, polis bi hinceta ku gerila tî gund li mirovan zilmê dikin.

Navenda Nûçeyan

Pêlên Radyoya Dengê Amerîkayê (Beşa Kurdî)

Li ser daxwaza xwendevanên xwe em hejmarên pêlên Dengê Radyoya Amerîkayê ya beşa kurdî didin. Bernamêyên kurdî her roj saet li navbera 18.00 û 19.00 tîna pêşkêşkirin.

19 Metro 15305 û 15255 Kîlohertz
25 Metro 11865 Kîlohertz
31 Metro 9615 Kîlohertz

Qertaf zengîniya zimên in

Di herdu hejmarên bihurî de vekolîna li ser berhemên rêzimanî domiya. Di vê de jî, emê li ser mijara paşgirên xebata xwe berdewam bikin.

5. Di "Hêmana Rêzimana Kurdî" de paşgir

Feqe Huseyn di vê xebata xwe de, 28 paşgir pêşkêş dîke. Ji bilî hebekê tev rast in. Heke em wan bi awayê rêza alfabe yê bidin:

ane, anî, ahî, ar, asî, ayî, baz, dang(k), dar, ek, ende, er, geh, ik, (i)stan, î, in, kar, ker, kî, mend, ok, ox, tî, van, xane, yar.

Herfên nava kevanê jî hêla min ve hatin danîn. Bi ya min qertafa "stan" ne bêyî herfa "î" yê ye û "g" ya di qertafa "dang"ê de "k" ye.

Paşgira ku min ev nepejirandiyê "kok" e. Ji vê re mînakên "sevîkok", "derîkok" û "jinîkok" hatine nîşandan. Ji wan mînakên jî bi awayekî zehf zelal dixuye ku, qertaf "ok" e. Ji ber ku peyv bi paşgiran, du car hatine çêkirin. Nimûne: jin-îk-ok.

6. Li gorî Kemal Badîllî paşgir

Rehmetiyê Kemal Badîllî, di berhema xwe de -her çiqas di bin sernavekê de paşgiran bi nav neke jî -22 paşgir destnîşan dîke. Ji wan yek jê, ne paşgir e. Paşgirên ku ji aliyê min ve rast hatine pejirandin ev in:

a, anî, al(î), ar(î), ax, e, ek, gûn(?), ng, ik, î, in, kar, kî, min(?), ok, onek, or, tî, van, war(?).

Herfên nava kevanan Badîllî bi xwe ew dane, nîşana pîrsê jî, ji aliyê min ve hate danîn. Di rastiye de ew "î" jî bi serê xwe paşgir in, ku ji wan re nimûneyên "zengarî" û "hevalî" dane.

Paşgira "gûn" û "gon" yek tişt e. Ji ber ku, herfên "o" û "û" bi hêsana dikarin bi hev biguherin. Mînak; Honandin-hûnandin, serok-serûk... Ji aliyê din ve K. Badîllî dema mînakên dide, ne "min"ê û ne jî "war"ê nolî paşgir nîşan nade. Lê dîsan min

ew, mîna paşgir qebûl kirin. Divê bê daxuyandîna ku "min" jî "man"ê tê. Ezê wekî "man"ê qertafê hildime dest.

Qertafa ku ne rast e jî ev e: "xoydan", diyar e ku peyv jî du hêmanan pêk hatiye; "xoy" û "dan". Di wir de "xoy"

7. Paşgirên di kitêba Mûrad Ciwan de

Mûrad Ciwan di vê berhemê de 42 qertafên ku, tên paşiya peyvên pêşkêş dîke. Ji wan me 15 liban wekî paşgir nepejirandin.

Li gorî rêza alfabe yê paşgir:


ane, ahî, anî, ar, ayî, baz, behd, dank, dar, ek,

Kin were gotin, ji aliyê ve "in" qertafa raderê ye û ji aliyê din ve jî ya kîsanê ya pîrehejmariyê ye; li gorî dema borî. "In" a di peyva "darin" de jî qertafa tewanga pîrehejmariyê ya nebinavkirî ye. Ji bo nimûne: Mirovine pak serî li me dan.

Ji yên mayî re ku em îzehetê bidin:

çolkî: Spîçolkî. Nimûneyek bi tenê hatiye nîşandan û peyv jî sê hêmanan pêk hatiye; "spî", "çol" û "kî". Di wir de "kî" bi tenê paşgir e.

Emîn: Yekemîn... Ev jî nolî "em"ê rêzê dide nîşan û bi soranî ye.



Zimanzan Feqe Huseyn Sagnîç

geh, gîn, ik, istan, î, in, k, kî, mend, ok, saz, tî, van, war, wer, wî, yar.

En ku wekî paşgir nehatine pejirandin:

an, andin, çolkî, dan, em, emîn, ê, hî, in, îyan, îyar, okî, olekî, otankî, tirin.

Ji bo "an", "andin", "dan", "em", "hî", "in" û "îyan" di pêş de daxuyandî hatin kirin. Lê ji bo "in"ê min divê ku ez hin daxuyaniyên din jî bidin. M. Ciwan jî "in"ê re ev nimûne dane: şuştin, darin...

Heke em li ser herduyan rawestin, tê dîtîna ku "şuştin" lêker e û di rewşa rader (mesdar)ê de ye û ji aliyê din ve jî, di halê kîşandî de ye.

ê: Paşiyê, dawiyê... Ev herfa tewangê ya zayenda mêtîyê ye.

îyar: Bextiyar... Paşgir di rastiya xwe de "yar" e û li gorî peyvê herfeke dengdêr dikare were pêşiya wê.

okî: Qirêjokî... Peyveke hevedudanî ye û ji "qirêj", "ok" û "î" yê pêk hatiye. "okî" bi serê xwe ne paşgir e.

olekî: Reşolekî... Ev jî, ji sê hêmanan "reş", "ole" û "kî" yê çêbûye. Di wir de tê xuyan ku "ole" û "kî" her yek bi serê xwe paşgîrek e.

otankî: Reşotankî... Peyv jî du rengdêr û paşgîrek hatiye holê; "reş", "tan" û "kî".

tirin: Mezintirin... Ji

bo muqayeseyê tê bîkarîna û bi soranî ye. Di kurmancî de jî dêla wê ve "herî" û "tewrî" tê xebitandin. Ji bo mînak: herî mezin, tewrî mezin...

Pîştî van nîrxandinan min divê ez yekûna hejmarên paşgirên ku di her heft xebatan de cih standîne û 61 lib in, pêşkêş bikim:

a: beza, zana
ahî: dûrahî, dirêjahî
ak: porçak, qûşak
al: heval, delal
ane: mîrane, dostane
anî: pîranî, mehanî
ar: mirar, guhar
asa: hûtasa, dêwasa
asî: tengasî, kêmasî
ax: antax, qûndax
ayî: reşayî, kûrayî
ban: pasban, kezîban
bar: xembar, guhêrbar
baz: şûrbaz, rimbaz
bend: nalbend, saz bend
ber: rêber, rencber
dank: derzîdank, kil-dank
dar: maldar, deyndar
e: xwende, nerme
er: koçer, pêjer
ek: serek, pişteker
ende: nazende, firende
fam: gulfam(?)
gar: şûngar, yadîgar
gaz: belengaz, gerdengaz
geh: pêgeh, bergêh
gîn: mizgîn, xwazgîn
gon: avgon, argon
ik: hîvik, kêrik
istan: kurdistan, şaristan
î: kurdî, botî
in: zêrîn, darîn
înî: pîrînî, bavînî
îtik: bangerîtîk(?)
kar: cotkar, goşkar
ker: zîvker, karker
kî: devkî, nivîskî
kîng: birakîng, zavakîng
mal: destmal, pêşmal
man: şadîman, encûman
mend: aqilmend,

hunermend
ng: çolang, soring
nak: derdnak, endîşenak
ok: kenok, şermok
lan: mozelan, kuçelan
ole: hişçolek, tirole
olik: gulolik(?)
onek: tîrsonek, bizdonek
or: gulor(?)
ox: gotox, dayox
oyî: şeroyî, germoyî
saz: çeksaz, diransaz
tî: pîsmamî, xînamî
ûr: rencûr(?)
van: aşvan, dergevan
war: bendewar, şalwar
wer: dilawer, bextewer
wî: rewî, bawî
xane: aşxane,

dermanxane
yar: bextiyar, pîrsiyar
ZANA FARQÎNÎ

DEFTER

Aliyên Ewrûpiyan ên pozîtîv û negatîv

Em carinan dema rûdîna û behsa kesên Ewrûpî dikin, bi tenê aliyên wan ên negatîv an jî yên pozîtîv digirin ber çavan. Yanî li gorî kesên Asyayî an jî Rojhilata Navîn di dinyayê de du reng hene. Reş û spî.


Rengên din tune ne. Heta ji wan herdu rengan jî yek heye. An spî ye an reş e. Ev ne rast e. Divê mirov aliyên Ewrûpiyan ên pozîtîv û negatîv bi hevdu re bibîne. Wê demê rastî derdikeve holê. Ez hinek li ser vê mijarê fikirîm û min li gorî xwe aliyên baş û xerab ên Ewrûpiyan yek bi yek rêz kirin. Min dît ku aliyên wan ên baş ji aliyên wan ên xerab an jî jar, gelek zêdetir in. Ez dixwazim wan herdu aliyên kesên Ewrûpî li jêrê rêz bikim.

Aliyên Ewrûpiyan ên pozîtîv:

- Xebat û jiyanekê wan ê biplan û program heye
- Bi perspektîveke dûr û dirêj li mijaran dinîhêrin
- Ji kar û welatê xwe pir hez dikin
- Di nava wan de tolerans heye û hevdu qebûl dikin
- Nefsbiçûk û rastgo ne
- Li qanûn û prensîbên xwe xwedî derdikevin
- Karên xwe saxlem û baş dikin
- Bidil û bêtirs kar dikin
- Ji xwendin û nivisandinê hez dikin
- Di babeta pîşe (meslek) an jî hobyên xwe de, xwe digihînin û dibin pispor.
- Epektîv in û giraniyê didine ser teknîkê
- Di nava xwe de demokrat in
Humanîst in...

Aliyên negatîv:

- Egoîzma şexsî û neteweyî di wan de heye
- Wêran û belavbûna malbatî civaka wan belav kiriye



AMED TIGRIS

- Bitenêmayîn, rewşa wan a psîkolojîk nebaş kiriye
- Nemayîna rûmetê hêjabûna mirovan li ba Ewrûpiyan nehiştiye
- Sarbûna tîkiliyên şexsî û civakî, mirov kirine robot
- Ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî û neteweyî prensîbên demokrasî û humanîzmê didin bin lîngan...

Belê, dema mirov karakter û taybetiyên (xisûsiyetên) Ewrûpiyan bihejmêre an jî behs bike, divê mirov herdu aliyên wan jî bibîne û bide ber çavan. Di carekê de, an jî bi gotinekê, wan mezin an biçûk neke û neke binê erdê. Heger mirov bi çavekî zanistî, hûr û kûr lê neke û temaşê neke, wê demê mirov bi hîsên xwe hereket dîke. Dema Ewrûpî tiştê baş bikin, em rabin wan derxin asîmanan û dema tiştê xerab an ne li gorî dîtin û berjewendiyên me bikin, em rabin wan bikin bin heft tebeqeyên erdê, ev ne rast e. Bingeha analîza me divê zanistî be, bêalî be.

Hûr û kûr be. Pîralî be. Na, heger em bi hîsên xwe hereket bikin, ev jî ne rast e û wê zirarê bigihîne xebat û civaka me ya pêş.

Divê em xwedî li aliyên wan ên baş derkevin û kelk (feyde) jê bigirin û qet nêzîkiyê li aliyên wan ên xerab jî nekin. Ne bi tenê yên Ewrûpiyan, her wiha ev jî bo her netewe, herêm an jî parzemînî (qitayî) wisan e.

EY REQÎB

Destana Koloxlî

Destana Koloxlî li herêma Serhedê di lihevruştinên êvarê de, li ser zimanan digere. Li anagorî destanê, Koloxlî di civakê de mirovekî tirsonek, pêxas û beredayî ye. Rojekê di navbera gund de dinihêre komek kûçik li ser kûçikekî pîr dicivin, lê newêrin êrîşî ser bikin. Ji bo ku kûçikê pîr bêdeng e, tevgerê jêhat dide xuyandin. Koloxlî piştî vê bûyerê xwe nû dike, jêhatî dibe. Jêhatîbûna kûçik ji xwe re dike cerib. Em dikarin li vir marê reş jî bibînin, lew re cihê dîtin û ceribanê di jiyana Kurdan de girîng û mezin e.

Em dîsa werin ser destanê. Koloxlî dike ku hukmê jêhatîya xwe li çiyana bike. Çi tomatî hene digire û dikeşe çiyayê Çepexçûrê. Têkiliya xwe û jiyana germ ji hevûdin dibire. Meh derbas dibin, dibe bihar; gundî dema diçin zozanan Koloxlî bi mirîti dibînin. Wî sedemê mirina xwe wiha aniye zîman: "Ez nemirim ji tîbûna, Ez nemirim ji birçîbûna, Ez mirim ji orîna çol çiyana" Ev destan dide xuyan ku tenêbûn di jiyana kurdan de rondikên çavan in, xemgînî ye, mirin e... Mirov vê rewşê dikare bi paqijî, diltenikî û jiyana kurdan ya kesayetiyê ve girêbide.

JÊHAT GIMGIM



Helbestvanê şoreşger Dildar

Bêguman heta niha piraniya xwendevanên kurd û welatparêzên gelê me yên li bakurê Kurdistanê der heqê sirûda me ya neteweyî û nivîskarê wê de biterahî ne xwedî agahî ne. Eşkere ye ku kurte ronîkirinek li ser vê mijarê karekî pêwîst e.

Nivîskarê vê helbestê, helbestvanê şoreşger Dildar e. Navê wî yê rastî Yunis Reuf e, wî bi navê Dildar helbest weşandine û ew bi vî navî hatiye nasîn. Dildar di sala 1918'an de li başûrê welêt, li bajarê Koyê, ji gundê Hecî Qadirê Koyê hatiye dinê.

Dildar helbestvan, parêzer (ebûqat) û ronakbîrekî hêja bû. Wê wî hîn pir xizmeta gelê xwe re bikira, lê mixabin jiyana wî têrê nekira. Ew di sala 1948'an de ku 30 salî bû çû ser dîlovanîya xwe.

Dildar di vê jiyana xwe ya kin de pir berhemên hêja dan, emê li wir tenê herdu deqên Ey Reqîb binivîsin ku orijînal wan bi soranî ye. Li binî jî emê kurmançiya wan bidin.

SORANÎ

Ey reqîb her mawe qewmî kurd zîman
Naysîkênê danerî topî zeman

Kes nelê kurd mirdûwe, kurd zînduwe
Zînduwe, qet nanewê alakeman

Qewmî kurd hestaye ser pê wek dilêr
Ta be xwên nexşî bika tacî jiyana

Ême roley Mîdiya û Keyxûsrew in
Dînimane ayînman her Kurdistan

Kes nelê kurd mirdûwe, kurd zînduwe
Zînduwe, qet nanewê alakeman

Ême roley rengî sûr û şoriş in
Seyrîke xwênawî ye rabirdûman

Kes nelê kurd mirdûwe, kurd zînduwe
Zînduwe, qet nanewê alakeman

Lawî kurd her hazir û amade ye
Giyan fîda ye, giyan fîda, her giyan fîdan

KURMANCÎ

Ey reqîb her mawe qewmê kurd zîman
Naşîkênê danerê topê zeman

Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe, qet nakeve ala kurdan

Qewmê kurd rabû ye ser pê wek şêran
Ta bi xwîn nexşî bike taca jiyana

Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe, qet nakeve ala kurdan

Em xortên Mîdiya û Keyxûsrew in
Dîn, îman, ayînman e, kurd û Kurdistan

Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe, qet nakeve ala kurdan

Em xortên rengê sor û şoriş in
Seyr bike xwîna ciyan me darijand

Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe, qet nakeve ala kurdan

Xortê kurd her hazir û amade ne
Can fîda ne, can fîda, her can fîdan.

Têbinî "milaheze"; Dildar yanî "Evîndar".

SÎRWAN NANEREQ / ATÎNA

KOMA GULÊN XERZAN



JI BÎR NABIN

Koma Gulên Xerzan

JI BÎR NABIN

Piştî bêdengiyeke dirêj, kasetên muzîkê yên bi kurdî derketin piyasê. Li gorî daxuyaniya çêkerên muzîka kurdî, wezaretê çandê destûra derxistinê nedidan wan. Koma Gulên Xerzan, kasetek bi navê "Ji Bîr Nabin" derxist. Ev kom, endama Navenda Çanda Mezopotamyayê ye û berhema wan bi alîkariya vê sazîyê hatiye amadekirin. Di kasetê de 11 stran û lawik hene û bi awayekî klasîk hatine strandin. Her wiha bingeha wê jî bi aletên muzîkê yên ku ji gelê kurd re ne biyan in, hatiye çêkirin. Gotin û awazên wê fesîh in û ji wan tîn sehkirin.

Nasirê Hemsoro û şanoya kurdî

Heya ji wan tê nahêlin gulîstana me bixemile!

Nasirê Hemsoro, piştî bîst û pênc saliya temenê xwe hay bû ku kêmasiyê kurdan a mezin di warê şanoya kurdî de heye, ji ber vê yekê tiştê nameyî kir ku karibe hin gava di warê şanoyê de biavêje. Ew kete Enstîtuya şanoya bilind. Li bajarê Şamê û di sala 1990'an de, di warê rexneya şanoyê de xwendina xwe bi serî kir û hin şano jî nivîsandin. Wek şanoya "Qerîn" ku hin komên şanoya kurdî ew li Şamê pêşkêş kirin. Lê nehate çapkirin.

Piştî ku Nasir şanoya xwe bi navê "Xewnên Pîra Berî Cejna Newrozê" çap kir û kete destê mîlet, bêhna neyar teng bû; gava ew gula di baxçeyê me de dîtin, ew li ber çavên nijadperestan bû strî û çav di serê wan de sor bûn. Nema karibûn bêhna xwe fireh bikin, piristiyên dewleta Sûriyeyê ew girt û avêtin binê zîndanê, bêsûc û



Berga pirtûka "Xewnên Pîra berî cejna newrozê"

sedem.

Bû 33 heyv (meh)ên Nasir ku bi hêviya rizgariyê wekî çivîka di redeke de. Lê di demeke nêzik de jî wê şanoyê wî bê çapkirin. Bila baş bê zanîn mamoste Yılmaz Güney di zîndanê de jî dev ji hunerê xwe berneda. Deng û hunerê gelê xwe gihande cihanê tev, wê Nasir jî wisa bike.

M. HEMO

YEW FÎLM YEW SERMIYAN

SALVADOR

Namey Fîlm:
"SALVADOR"
Sermiyan:
Oliver Stone
Seneryo:
Oliver Stone,
Richardson
Mûzîk:
Georges Delarue
Kaykerdoxî:
James Woods,
James Belushi,
Micheal Murphy,
John Savage, 1986,
USA

Oliver Stone, 15.9.1946 di New York ti ameyo dinya. Pî jey Amerîkayîj, may jey zî Fransa ra ya. Yew beyntar mektebê xwi weradano şano rojhelatan duro ra geyreno. Badî yenno enî mektebê xwi newe ra biwano, nawê veynda-yişê hokmatî ser, 1967'di şono Vietnam di eskerey. Di ray birindar beno...

Eskerey ra pey seneryoy "Platon"î nuseno. Labelê seneryoy jey hiç yew film şîrketî qebûl nekenê. O zî yew wext him çend cay ra xebitiyeno, him şono kurstê sînema. Badî, senaryoy Trîna Nêmey Şewî (Night Express) nuseno...

Tira pey zî dest bê sermiyaney keno, daha zaf zî filman di politikayo sero xebityeno...


Novelonê film da "SALVADOR" î, El Salvador di (1980) veyrana. Beyntar dê gerilayan dê Eniya Rizgariya Ferabundo Marti (FMLN)'yo diktator Duarte man di yew cengo pîl esto (sey PKK'yo TC) Hemma ca sey canimî yo... Kuştixî dewleti hemme ca di teror kenê !.. Amerîka zî hemme çide xwi reyde paştî dana diktator Duarte rê...

Richard Boyle (Ja-

mes Woods) zî meslegê jey rojnamevan o. Labalê Ina sira bê kar o, bê gurey o. Xurê yew embaz veyneno (Dr. Rock/ James Beylushi) meslegê jey zî radûn û TV sero yo. Wirdî piya yew benê şonê El Salvador. Derdê jîn werê herb merb niyo, ê wanê ma xure şorê weyra belkî yew gure mire weynê... Labalê ki kenê gurê man nawê niştê tira wejî. Hinzar o yew gure yenno sere dê jîn, hizar yew cî weynenê... Ayê gurey ki film di nawnenê hema hema pêro rašta seredê jîn ra viyard tî...

Fîlmê Jey bînî:
Seizure (Nowbet)
The Hand (Dest)
Platon
Wall Street (Borsa)
Born on the Fourth of July (Çiyer dê aşm da Tîrmeh di biyo)
The Doors (Derî)
JFK

CEMAL PÎRANIJ



Sermiyan:
Oliver Stone



James Woods rojnamevan Richard Boyle'î kay keno

KELEPOR

Rewez

Xwênerî berêz û hêja... Pêş hemû şitêk xoş halî xomit pê radegeyemim ke îdî hemû rojî şeme yek debîn be haw jiwani yek û yek dî dedwênî. Diyar e eme bo min mayey bexteweriyekî gewre ye, be hîwam ke bo toş mayey xoş halî bêt "her rûy demim le to ye" eger rojî le rojan îş zanî biwe, be bar be ser şanî Welatê me we û toş yekêkî ew welatey, obalim be estot eger bê deng bît... Dexwazim berde-wam hawkarî yekdî bikeyên û be tenha her to giwê le min negrît, belkû min îş guhdarî to bikem û rexne û têtîniyekanî der barey goşeke bixwênim ewe, çûnke lem goşeyê da zor babetî cora w cor dehênî e ser xwanî giftûgo. Le wane ye bipirsîn û bilên: Goşey soranî bo û le ber çî? Min îş: Xwa ne xwaste nalêm pirsîyareke tan le cêy xoy da niye, nexêr. Belam bo em roy roj-namey Welatê Me be carêk pêwîst e ku nebûnî nusînî soranî kelênêk dirust dekat. Aşkirayş e le em roy barî çandî û hunerî niştîmanekeman da zarawey soranî gûlêkî geşî baxçey zimaneke-man e. Aşnabûnî xwêneranî bakurî Kurdistan man bew zarawe ye sûdêkî fire gewrey debêt û debête hewênî têkelî

ayindeyekî nîzik. Le gel hemû emaneş da lêtan naşarim ewe ke car car be kirmancîş tiyay da denusîn, diyar e ew zaraweyêş parçeyekî tîrî cigerman e û bo emey soran îş fêrbûnî erkêkî pêwîst e.

Berêzan im: Em careyan û le goşey em jûre teng ewe debê be kurtî bîbirim ewe, hemû şitêkan be çîrî û pîrî berceste bikem, çûnke berde-wam gileyî biraderanî çap im le ser e û pê m delên dirêj dadîrî zor dekey, bawer biken zor bilêyîm bo xoşewîstî ewe û Welatê Me degerêt ewe, dema şitêkî dî le gorê da niye.

Take şitêkî pêwîst ke mabêt ewe ye: Dezanîm detanewê bizanî Rewez çî ye û yanî çî? Birayîne rewêz wişeyekî soranî ye be zorî le nawçey Mûkiryân be kar dehênrêt, lew nawçe ye be dane berdî xiz û kûn kûnî binarî çiyakan delên rewêz, car car îş be cêgeyekî xiz û kûn kûn îş delên ke le çiyayek ewe derde-poqê. Dilniya bin... Rewez le cêgeyxoy ewe pilewke berdî rîq û qîn debêt bo dîjminan û nahez anî Welatê Me... Beranber be weyş, şadîman debim, eger bêbe berdî jêrdîwarî helçîrawî hîwakantan.

SÎRWAN NANERQ

**Eger tu
ji zimanê xwe
hez dikî,
Welatê Me
bi yekî/e din jî
bide xwendin!**

Sêvê, keçikek biçûk e. Çavên wê şîn, porê wê zerîn e. Sûretê wê wekî hinare ye. Brû û bijangên wê reş in. Diya wê her sibe porê wê şe dîke, guliyên wê vedigire.

Birek (kerî) pezê mala bavê Sêvê heye. Kar û berxên wan jî zehf in. Sêvê ji wan berxan yekî ji xwe re nîşan dîke. Dîbêje: "Ev berxamin e." Berxika wê yekê qer e. Pozê wê hilû û netika wê beş e. Serê dûva wê û lingê wê yê pêşiyê spî ne, wekî xirxalekê. Hiriya wê kurîşk kurîşkî ye. Sêvê zehf ji berxa xwe hez dîke. Di nava cihê xwe de dîde razandin. Wisa jê hez dîke ku, pariyê devê xwe dîke devê wê. Ji ber wê navê berxikê datînin 'Delaliyê'.

Di biniya mala wan re çemekî biçûk derbas dibe. Sêvê rojekê Delaliyê hildide diçe ber devê çem, li wir qamîş bilind bûne. Perperok û elîqopter li ser difirin. Perperokên sor, kesk, spî. Ji aliyekî ve pelepûç difirin û li ser gulên qîçik datînin. Sêvê didê pey perperok û pelepûçan. Di nava hêşinayî û gul û sosinan de dileyize.

Sêvê û Delaliyê

Pelepûçekê digire dîde ser destê xwe. Bi dengê xwe yê xweşik: "Bifire kur e, bimîzê qîz e" dibêje. Ji xwe re wisa dileyize û Delaliyê ji bîr dîke.

Delaliyê jî diçe, ji xwe re li ber devê çem digere. Ew jî dîde pey perperok û minminîkan. Direve, beq ji ber baz didin. Kosî serê xwe dikîşînin nava qa-

likên xwe. Beqeke kesk û çavbeloq li ser çîmganê avê sekiniye, weqe weqa wê ye. Guhên wê dibin pîfdanok û sist dibin. Delaliyê guhê xwe fit dîke û wi-

sa lê dinêre. Delaliyê di ser beqê de diçe. Piyê wê dişiqite û dîkeve çem. Dibe meye meya wê. Xwe davêje kendal. Dîke nake nikare derve.

Dengê Delaliyê bi ser Sêvê dîkeve. Sêvê direve tê ser kendal dîsekine. Dibe qêrîna wê, digirî. Nikare Delaliyê derxe. Hêsirên wê wekî baranê dibarin. Direve malê bang li diya xwe dîke. Diya wê Sîrsûm berdide direve devê çem. Bala xwe didê ku Delaliyê nîvxeniqî bûye. Ji avê derdixê tîne malê. Berxika reben wekî şiva nava avê diricife. Cilekê davêje serê. Delaliyê germ dibe.

Kalekala diya Delaliyê ji gomê tê. Dibin cem diya wê. Delaliyê noqan lê dixê, şîr dimije. Diya wê jî dûva wê bêhn dîke û bi berxika xwe şad dibe.

Diya Sêvê destê wê digire, dibêje: "Keçamin a şîrîn, bêyî me bi tenê derneyê, dîr neçe. Ka tiştêk bihata serê we minê çawa bikira."

Sêvê xwe diavêje hemêza diya xwe û kelogirî dibe. Dîbêje: "Dayê ez êdî ji gura te dernayê. Ez ji te jî, ji Delaliyê jî zehf hez dikim."

TURAN ÇABUK



N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Kurd bi zimanê xwe kurd in

Her tiştî ez kurd im! Ez kurd im belê bi çi yê xwe ez kurd im? Bi zimanê xwe ez kurd im. Ez bawer im ku hingî me pir zilm û zordariya tirk, ereb û faris kişandiye, me zimanê xwe jî bîr kiriye. Lê belê ferqa me ya ji wan, zimanê me ye. Îro li dinyayê her însan bi zimanê xwe tê naskirin. Zimanê gelan bi gelan pir bi rûmet e. Ji ber ku li ser zimên bi zêdeyî kolonyalîstî hatiye kirin, em li zimanê xwe xwedî derneketine. Ji ber ku îro Roj-

nameya Welatê Me bi kurdî dinivîsîne divê em li Rojnameya Welatê Me xwedî derkevin. Ez bangî keç û xortên kurdan dikim. Rûmeta zimanê xwe baş bizanibin û bixwînin, bidin xwendin. Wezîfeya me ew e ku em li welatê xwe xwedî derkevin. Bi derketina Rojnameya Welatê Me ez pir kêfxweş bûm.

Abdurrahman Kaya
Kevezaxwarî

Bi navê welatekî serbixwe û azad

Ey rojnameya pîroz û pak Welatê Me! Ey hevalên hêja û serbi-

lind, welatparêz û şoreşgerên Welatê Me. Ez gelekî kêfxweş û serbilind im, bi vê rojname delal û buha. Ez pir spasiyê li we û li Welatê Me dikim, rûdariya min ji vî karê we re heye, hêvîdar im ku hûn vî karî bi serkeftin pêşve bibin û bigihînin heta dawî.

Bi rastî rojnameya Welatê Me, cihekî bilind û girîng digire. Hem di warê zanyarî û ramanyarî de û hem di warê çand û toreyê de. Lê mixabîn şermiyeke giran û qebhetekê mezin e ku hejmara xwendevanên bi zimanê kurdî pir kême.

Lê şan û rûmet e ji min re, ku ez ji xwendevanên Welatê Me me. Ji bo xebat û têkoşîna we, ez bêwestî û serkeftinê daxwaz dikim.

Y. Bulut

Gelekî bêziman ne azad e!

Silav li we gelî xebatkarên Welatê Me. Ji bo ku we rojnameyeke bi zimanê kurdî derxistiye ez we pîroz dikim.

Mijara zimên zehf girîng e. Divê ku heya ji destên me bê, em bi zimanê xwe bixwînin, binivîsin û wî bi pêş ve bibin. Lewre çand, huner, wêje û hatina mirov bi zimên ve girêdahî ye. Gelekî bêziman, tu carî azad nabe û herdem bîndest û xizan dimîne. Ji vê yekê re mînaka mezin kurd in.

Daxwaza min jî we ev e ku hûn zimanê kurdî

xweş bi kar bînin û ji berdêla peyvên kurdî hûn ên bi tirkî nenivîsin. Ji aliyê din ve heke hûn nîv rûpelî ji ferhengê re veqetînin ezê gelekî kêfxweş bibim.

M. Taşın / Wan

Em pêşveçûna we dixwazin

Dostên hêja... Me saleke bi têkoşîne dagirtî li dû xwe hişt. Ew têkoşîna ku em ji bo azadbûna mirovahiyê didin, biratiya gelan a kurd û tirkan li ser bingeha înternasyonalîzmê xurt û zexim dîke.

Em sala 1995'an wekî

sala ku wê serkeftina têkoşîna me hîn bêhtir nêzîk bike, dibînin û di têkoşîna û jiyana we ya weşanê de pêşveçûnê dixwazin.

Li ser navê dilên PKK'yi
M.Can Yüce
Girtîgeha Çanakkaleyê

Hevalên hêja, ji bo vî karî ez we pîroz dikim. Ez kurd im, lê bi zimanê xwe baş nizanim. Zimanê min ê dayîkî bi tirkî ye. Ev çend sal in ku ez li ser zimanê xwe dixebitim. Xwendin û nivîsandina min hinek bi pêş ve çû. Ji ber tîrsa çewtiyan, ez nivîsa xwe pir dirêj nakim. Ez dixwazim ku di vî karî de hin alîkariya min jî hebe. Çend pêkenok û helbestên xwe ji we re dişînim.

Ronî Jîr / Ruha

Lêpîrsîna ku me heftiya çûyî li ser sala 95'an çêkir, di teoriyê de encameke (netîceyê) baş deranî holê. Hemû sazî û rewşenbîrên ku me dîtinên wan pîrsîn, dianîn ziman ku gerek e sala Ehmedê Xanî ji bo kurdan bibe sala pêşvebirina çand û zimanê kurdî. Jixwe em jî wek rojnameya Welatê Me li benda encameke wisa bûn, ji ber vê yekê me jî got bila sala 95'an ji bo kurdan bibe saleke xwerû bi kurdî. Esas, ev çend sal in ku ji aliyê sazî û rewşenbîrên kurdan ve hêviyên wisa têne ziman, lê tiştê kê m pratîk e. Yanî li ser pêşvebirina ziman û çanda kurdî gelek tiştên teorîzekerin, lê gavên berbiçav nayên avêtin. Ji ber wê yekê li vir ez pêwîst nabînim gotinê zêde dirêj bikim, dixwazim behsa gavên pratîk bikim. Lê pêşî lazîm e ev bê zanîn: Ji bo ku ev sal bibe saleke xwerû bi kurdî bîngehek lazîm e. Bîngeh zêdekirina xwendevanan e. Emê vê carê berevajiyê carên din pêşî dixwazin gavên berbiçav ên li gor hêza xwe biavêjin. Gava me ya pêşî kampanyaya zêdekirina xwendevanan e. Emê bi alîkariya xwendevanên xwe dest bi vê kampanyayê bikin. Ji bo kampanyayê formuleke me ya pir



JI WELATÊ ME

Mazhar GÜNBAT

Vê nivîsê bixwînin bidin xwendin!

hêsan heye. Formul ev e: **Em dixwazin her xwendevanekî(e) me, kurdekî(e) ku rojnameyê naxwîne, bibîne û her hefte Welatê Me pê bide standin û xwendin. Yanî divê her xwendevanekî(e) Welatê Me, ji rojnameyê re xwendevanekî(e) nû çêbike û her tim wî(ê) kontrol bike ka ew kes Welatê Me distîne an na. Eger ew kes baş nîkaribe bixwîne, gerek e alîkarî pê re bike, ta ku baş hîni xwendinê bibe. Dema hûn baş emîn bûn ku xwendevanê (a) wê edî her tim rojnameyê taqîp dîke û her hefte distîne, ji kerema xwe re hingê vê nivîsa ku hûn dixwînin fotokopî bikin bidine wî (wê) da ku ew jî, ji Welatê Me re xwendevanekî (ê) bibîne û çî**

tiştê we kiriye ew jî bike. Xwendevanên Welatê Me abînin hindik in, lê em bawer in yê ji dil û can bi Welatê Me ve girêdayî ne û evîndarên zimanê kurdî ne, ji ber vê taybetiya wan, ewê di demeke kin de bi hêsanî xwendevanên nû çêbikin ji rojnameya xwe re. Ka bifikirin, îro yê mîna Kenan Evren û Emin Çölaşan jî kenê xwe bi gelê kurdî dikin, dibêjin jixwe zimanê wan tune, ku zimanê wan hebûya wê berhemên kurdî hebûna, wê xwendevanên kurdî hebûna. Turgut Özal jî her tim digot, bila hema kurdî serbest be, çawa be kes bi kurdî naxwîne. Gerek e gotinên van dijminên gelê kurdî pir li zorê me biçin û divê her yek ji me di îrada wan de be jî, ji Welatê Me re xwende-

vanekî (e) nû çêbike. Eger bi rastî jî hûn dixwazin gelê kurdî bi pêş ve here û eger hûn ji gelê xwe û ji zimanê xwe hez bikin, her yek ji we xwendevanek bibîne. Gerek e em mîna wezîfeyekê li vî karî binêrin. peydekirina xwendevanek wezîfeyekê pir hêsan e lê ku berdewam bibe karekî wisa giranbuha ye ku dikare qedera gelê kurdî biguherîne. Ji ber ku eger ev sîstem rûnê û cihê xwe bigire, di salekê de hejmara 2-3 hezar xwendevanan wê bi deh hezaran bête hesabkirin û hertim ev hejmar wê bilindtir bibe. Ma ku di civakekê de di salekê de hejmara xwendevanan %1000 zêde bibe kî dikare înkâr bike ku qedera wê civakê neguheriye? Eger hûn dixwazin ev sal bibe sala Ehmedê Xanî, bi lezginî hema ji niha ve dest bi pêkanîna formula li jor bikin. Şehîdê gelê kurdî Apê Musa digot: "Xortên kurdan, heta niha we guhê min bir, bê çima ez bi kurdî nanivîsim, îca jî bixwînin. Gerek e di deh rojan de hûn hîni alfabeya xwe bibin, name û nivîsên xwe bi kurdî binivîsin. Bavê mino, xortino de ez we bibînim."

WELATÊ ME

Rojnameya Heftiyê (Haftalık Gazete)

Li ser navê ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına Xwedî (Sahibi) **Aynur BOZKURT**

Gerîndendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni) **Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran (Yazışleri Müdürü) **Mehmet GEMSİZ**

Berpirsiyarê Nûçeyan (Haber Sorumlusu) **Suut KILIÇ**

Redaktor **Sami TAN**

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî (Halkla İlişkiler Müdürü) **Sıraç AKSOY**

NAVNİŞAN (Adres) Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX 249 13 44 - 245 29 91

ÇAPXANE Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ (Temsilcilikler)

- Hewlêr- Niwa Hebib Suriye- Jan Dost Fener Rojbiyanî
- Berlin- Soliman Sidou 49-30-69 00 26 95
- Badenwurttemberg- A. Rahim Ayaz 49-75453258
- Hamburg- A.Hekim Gülsün 49-40-40 33 88
- Bonn- Ahmet Baraçkılıç 49-228-66 62 49
- Amsterdam- Cotyar Saxoy 31-20-613 07 66
- Swed- Amed Tigris 46-8-740 69 81
- Hannover- Selim Biçük 49-5721-813 60
- Munchen- Mahmut Gergerli 49-871-670 884
- Atina- Sirwan Reşid Bekir Bahoz 30-1-3634905

N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Evîndarê welêt im!

kim. Hebekê raman dibûm min digot: "Wê Serok ji min razî bibe gelo?"

Helbesteke ku min li ser welêt nivîsandibû, min jê re dixwend. Helbest wiha bû:

Delala min!
Ew çavên te yên reş
Ew ekla te ya xweş
Ez şewitandim
Bextê te yî reş

Delala min!
Ji te dûr hêstirên çavan dibarînim

Wekî barana hûr
Kengê wê xelas bibe
Ev hesreta kûr?

Serok wekî herdem bi wê bîr û bawerîya xwe ya qewîn digot: "Xorto! Benda duduyan bi wî awayî çênabe. Ku tu bi welêt evîndar bî, tu ji welêt narevî. Tu ji welêt bi dûr jiyan nabî û nagirî."

Bi rastî divê wekî gotinên wî be. Jixwe her rojê min a ku li metropolê derbas dibû wekî dojhê bû. Min soz û qerar da, welat ez tîm. Mirin jî te ji min hew diqetîne.

Qeremana Elîbî

Rojnamegeriya kurdî serbilindî ye

re kirin. Dewlet bajar, gundan, daristanan, rojnameyan bombe dîke, lê keç û lawên kurdan êdî li çiyên şervan in, li bajar, rojnamevan in.

Bi vî tehrî em dizanin û bawer in hemû rûmetên kurdan wê rojnameya gelê me Özgür Ülke jî bijî û rûmetiya xwe mezintir bike. Rojnameya Özgür Ülke bi berxwedanekî gewre hatiye îro û wê heta dawiyê ji bimeşe. dilê me û destên me gişt wê heta dawiyê bi Özgür ülkeyê re be.

Çiya Sîpan

Serkeftin ji we re

Rojnameveniya kurdan di nav dîrokê de her tim bi derd û bela û bi ketin, rabûn heta roja îro meşiya ye. Dijminên gelê kurdî çawa ku xwestine Kurdistanê békurdî bîhêlin, wisa jî xwestine gelê kurdî bîbîr û bêmeji bikin. Lewre, dijminê kurdan baş dizanîn, dema kurdî aliyê xwendin û zanîtiyê ve-bi pêş bikevin êdî ne mumkun e bindestiyê qebûl bikin.

Rojnameya Özgür Ülkeyê jî wek hemû rûmetên kurdan bi fedekariyê mezîni hatiye afirandin. Ew şerê qirêj ku dewlet li Kurdistanê hê jî didomîne, li ber çavan eşkere dîke. Rûyên dewletê yê qirêj jî aliyê Özgür Ülkeyê ve hate eşke-

Roja Welatê Me derket em bi lez beziyan cem bayî û me ew bi dilgermî stand. Em pir pê kêfxweş bûn ji ber ku, zimanê wê feshî tê nivîsandin û bi rihetî tê xwendin. Ji ber wê

yekê, ez hevalên ku di rojnameyê de dixebitin pîroz dikim.

Gayê Rûniştî /Amed

Rexneyên Dilbixwîn li cih in!

Xebatkarên Welatê Me yê hêja... Di hejmara we ya 6'an de nivîseke Dilbixwîn derket. Rexne li ser zimanê Welatê Me kiribû. Ez bi xwe tevlî rexneyan dibim. Min ev tişt dabûn xuyakirin, di nameyên xwe yê ku ji we re hatibûn şandin de, mixabin xuya dibe ku neketine destê we.

Dîsa ji we re serkeftinê dixwazim, lê dixwazim ku nameyên min giyabin we hûn min agahdar bikin.

M. Mehemedî Girtîgeha Bartînê

Bi berçavkên rewşenbîrekî kurd ji her aliyê ve Kuba

Li Kubayê tengasî zehf in



Serokê Şoreşa Nîkaragûayê Daniel Ortega: "Ez gelê kurd nas dikim, têkoşîna gelê kurd jî nas dikim."

Osman Özçelik bi rasthatina rojên dostên Kubayê berî çend hefteyan çûbû vî welatî, li wir civîna ku gelek rêxistinên di nava dostên Kubayê de beşdar bûn pênc roj dewam kir. Özçelik li ser rewşa Kubaya îro çavdêriyên xwe ji bo rojnameya me nivîsandin. Em dixwazin ku xwendevanên me jî bi vî rêzenivîsa wî ya çavdêriyê ya xwerû bi kurdî jî rewşa Kubayê haydar bibin.

Li Kubayê şopa du tiştan bala mirov dikşîne. Şopa avahiyên kolonyalistên Îspanî û şopa dilgermiya Ernesto Che Guevara. Kolonyalistên Îspanî Kuba talan kirine, lêbelê avahiyên qenc, bajarên fireh û miferih li şûna xwe hiştine ku iro her bajarekî Kubayê wek muzeyek vekirî ye. Komunîstan tu zêdeyî li wan nekiribe jî, bajarên xwe parastine. Sala çuyî bala min kişandibû. Ew avahiyên rewnaq, ew avahiyên dîrokî bêboyax mabûn. Ablûkaya Ame-

rîkayê, hilweşandina sazûmana sosyalîst Kuba ji xafil de girtibû. Ne nan, ne xwarin, ne petrol û ne jî derman di destên wan de hebû. Kubayîyan têkoşînekê dijwar didan. Avahiyên wan bêboyax jî dibûn. Birçibûn bizehmet bû. Belê bawerî û fêza mirovahiyê wê rojekê bi ser biketa. Fîdel û partiya komunîst hebû, qey wê riyek bihata dîtîn.

ÇAVÊN KUBAYÎYAN

Li çavên Kubayîyan qenc mêze bikin, hûnê hinek tiştan bibînin. Yek jê, bextreşîya çar sed sal berê ji Afrîkaya Reş hatina bikoletî ye. Ev serê sed sal in ku Kubayî ji koletiyê xelas bûne û ev sih û pênc sal in ku ew di wekheviya sosyalîzmê de dijîn. Dîsa di kûraniya çavên Kubayîyan de tirs xuya ye. Tirsaxezalan, tirsaxezalên neçîrvan li dû. Ji ber vî ye ew di her fersendê de dibêjin "Si Por Cuba" ango "Ji bo Kubayê Erê". Em di ber hewşa dibistanekê re derbas bûn. Zarokên biçûk bi kincên sor û spî li derve derketibûn dersa sporê... Di dersa sporê de silav dan, rep rep meş, çep û rast zivirîn ne dikirin. Mamosteya jin ew hînî dansê dikirin. Zarok bi kêf û henek, bi ken di dersa sporê de hînî dansê dibûn.

Îsal em 17 kes ji Tirkîye çûbûn Kubayê. "Instituto Cubano de Amistad Con los Pueblos" Bi kurtayî "ICAP" ango "Enstituya Dostaniya Gelan"

bi navê "Encuentro Mundial De Solidaridad Con Cuba" ango "Ji bo Alîkariya ji Kuba re Hevdîtina Dinyayê ya Yekemîn" civînek fireh pêk anîbû.

Armanca civîne; li ser ablûkaya Amerîkayê, hilweşandina sazûmana sosyalîst, birîna tîkiliyên aborî yên dewletên sosyalîst bi Kubayê re, çareserkirina pîrsgirêk û astengiyên aborî bû.

Ji Afrîkaya Başûr, dewletên Ewropayê, Hindistan û heta Amerîka Latîni, ji 109 dewletan 2700 nûner beşdarî civîne bûbûn. Kubayîyan organîzasyonêke birêkûpêk ava kiribûn.

Ji partîyan;

Partiya Karkeran (IP)
Partiya Sosyalîsta Yekbûyî (BSP)

Partiya Demokrasiyê ya Gel (HADEP)

Ji rojnameyan;

Özgür Ülke, Günaydın, Cumhuriyet.

Ji televizyonan; Kanal D, ji kovaran; Öğretmen Dünyası, Komîteya Dostên Kubayê li Tirkîyeyê, Serokê Belediyeya Esenyurt-Stenbolê û çend rewşenbîr û sosyalîstên serbixwe. Giş bi hev re 17 mirov hebûn.

Civîni li "Şanoya Karl Marks" ji 21'ê sermayezê heta 25'ê sermayezê pênc rojan dom kir. Her du rojên pêşiyê, bi piranî nûneran dîtîn û gotinên xwe pêşkêş kirin. Du rojan sê komîsyon xebitîn. Roja paşîn biryara civîne amade bû û Fîdel axaftînekê dirêj kir.

Min xwest li ser navê



Ji gelek welatên dinyayê bi sedan nûnerên partî û rêxistinên beşdarî şahîya li Kubayê bûn.

kurdên Bakur; li ser rewşa kurdan, têkoşîna gelê kurd bipeyivim û silav û piştgiriya gelê kurd pêşkêşî gelê Kubayê bikim. Minê axaftîna xwe bi kurdî bikira. Axaftîna min ya bi kurdî amade bû, wergera tirkî û ji tirkî wergera Îspanyolî bi alîkariya nûnerê Avûsturyayê ku bi tirkî dizanibû, çebû. Me nivîsa Îspanyolî jî pêşkêşî berpirsiyarên civîne kiribû.

BERSIVA MARTÍNEZ

Dora axaftîne nehat ser me. Yên bêaxaftin man bes ne em bûn. Gelek nûner jî, neaxivîn. Heta vir tiştêkî ku mirov dilê xwe bihêle tune. Gava roja paşîn min berpirsiyarê ICAP'ê yê beşa Tirkîyeyê Javier Domínguez Martínez dît û min gazine xwe kirin, bersiva wî wekî aveke sar di ser min de bû. Min jê re gotibû "Hûn dizanin ez

nûnerê kurdan im. Ez û gelê kurd em dostên Kubayê ne. Min dixwest silavên gelê Kurd pêşkêşî gelê we û nûnerên civîne bikira û we destûr neda min." Û min dom kir: "Em dizanin pîrsgirêkên Kuba yên aborî zehf in û girîng in. Belê, li welatê min şerekî bi qirêj didome. Xwîn dirije, gund tene şewitandin û gelê min tê qirkirin. Zimanê me qedexeyê, em li ser axa xwe kole ne. Minê bala Kongreyê bikişanda ser şerê qirêjî".

Bersiva Martínez: "Em bi pîrsgirêka we dizanin, belê Kuba nikare vî pîrsgirêkê çareser bike! Ev problema Tirkîyeyê ya hundirîn e. Em naxwazin tîkiliyên xwe û Tirkîye xerab bikin. Hêviya me ev e ku ev problema hanê bi aştî çareser bibe." Dîtînen Kubayê yên fermî wisa bûn.

ORTEGA Û GELE KURD

Serokê şoreşa Nîkaragûayê Daniel Ortega wilo nedifikirî. Bi hevnasîna me destê xwe ji dil dirêj kir û me hevdû hembêz kir. "Ez gelê kurd nas dikim, ez têkoşîna gelê kurd jî nas dikim. Dîtina min ev e ku têkoşîna gelê kurd, di nava têkoşîna gelan de ya herî şoreşger e. Dilê min bi gelê kurd re ye." Ev gotînan ji devê Daniel Ortega derketibûn û dilê mirov di germa Kubayê de hênîk dikir.

Ji Afrîkaya Başûr, ji Perû, ji Meksîka û heta Bolîvyaya em bi kîjan nûnerî/ê re dipeyivîn û me ji kê re digot; "Ez kurd im", ji dil em hembêz dikirin.

Xuya ye ronahî ne dîr e...

OSMAN ÖZÇELİK
Wê bidome



Pûroya ku li Kubayê tê çêkirin, li hemû dinyayê tê zanîn.